


a

şîkar e ku divê mirov li van xak

û erdan bibe terefek.

Terefbûn jî, tê vê maneyê ku mirov divê nasnameya çandî ya Mezopotamya û Anadolê, zimanê gelê bindest, bi kurtasî bindestan biparêze. Ev têkoşîn jî, divê tim û her gav, li her der û warî bê dayîn.

Beriya her tiştî, hunermendê tiyatroyê divê ji ezîtiya xwe azad bibe, ji ezîtiya xwe bifilite. Pişt re jî civakê serbest bike. Çend sal berê li vî welatî ne zimanê kurdî, telafuzkirina peyva "kurd" qedexe bû. Ev leke ku malaştina wê gelekî zor e, li pêşiya hunermendan e.



Endamê Koma Şanoyê ya Can Şenliği Müjdat Albak:


Tiyatro

hewcedariyek e

Rûpel 8-9

- EZNAS MAYA **bi awayê nûçe-şirove, bi sernavê "Jêderka qirêjiyê şerê taybet e", li ser berdana leşkeran, sendroma şer û rewşa siyasî ya Tirkiyeyê disekine.** Rûpel 3
- "Rola girîngtirîn a rewşenbîr e di nav millet de", hevpeyvîna HELÎM YÛSIV **ligel Bêpîrsê Kovara Stêr Erdewan Têmûr.** Rûpel 4
- Nivîskarê me DILBIXWÎN DARÂ **bi navê "Nobedarê kulturê", tiliya xwe datîne ser mijareke girîng** Rûpel 13
- EŞREF SÎDAR **Komcivîna Perwerdehiya Demokratîk şopand û bi navê "Li Kurdistanê mamoste bi çek digerin", çavdêriyên xwe nivisandin.** Rûpel 16

NAVEROK




7

Düzgün Deniz: Filmekî neo-kevnar! 'Eşkiya'



10

Hesên Zinar: Gilokek agir



11

Li Helebê şevbuherka çîroka kurdî

Ji Xwendevanan

LI welatê me stêrk li ezmanan bêronî, ava çeman miçîqî; ji hewayê behna barûdê difûre. Lê îro welatê me biye stêrka cihanê. Axa me ya pîroz çavkaniya şaristaniyê ji nû ve bû "Welatê Rojê". Ba û bahoz û bagirên ku ji deşt û zozanan radibin li cihanê hilma mirovahiyê vedikin.

Li "Welatê Rojê" neviyên medan kevokên aştiyê gerîla her wekî destpêka mirovahiyê, komara mirovahiyê ava dikin. Belê, di, 27'ê sermawezê de gaveke girîng ji bo pêkanîna hevî û daxwazên gelê me û gelên Rohhilata Navîn hatiye avêtin. Ev cejna giranbuha li hemû xebatkar, xwendavan, rewşenbîr gelê me pîroz be.

AHMED BENEK

HER wekî hûn ji dizanin îsal şerê rizgariya welatê me gihîştîye merhaleyê nû. Êdî şervanên azadiyê bi çalakîyên întixarî xewên şevan li mêtîngeran diherimînin, ziravên wan diqetînin. Êdî mêtînger wekî ku ji melkemat ditirsîn, ji jinên ducanî ditirsîn. Her jîneke ducanî li ber çavên wan dibe şervaneke azadiyê.

Bi nivîsa vê nameyê ez careke din dibêjim, hemû pakrewanên azadiyê di nava dilê min de cih girtine. Bi taybetî şehîdên li Zîdana Amedê, Rehşan, Zekiya, Bêriyan û Ronahî û Rewşen, Zilan û Bermal heta roja gerdûnê ya paşî wê di dilê min û di dilê hemû rizgarîxwazên welatê mêtîngeh de bijîn.

GIRÊ DERSILÊ



Merheba ji we re

SAMI TAN

Her wekî çawa piştî her ketinê rabûn têt, wisa jî li dûv her xatirxwestinê, merhabayek têt. Hefteya çûyî hevâlê me Mehmet Gemsiz bi nivîseke xatirxwestinê dabû zanînan ku ew nivîsa wî ya dawîn e di vî quncikî de. Birêz Gemsiz egerên wê yekê jî bi awayekî zelal diyar kiribûn.

Her wekî di wê nivîsê de jî bi gotinek Apê Mûsa hatibû daxuyandin, ev pêşbaziyeke domdar e, bes al ji destekî derbasî destekî din dibe. Peywira ku ji aliyê wî ve bi dilgermî dihate kirin, ji vê hejmarê pê ve dikeve ser milê min, ezê jî bi heman dilsoziyê vê peywîrê bidomînim, heta ji min jî al derbasî hevaleyê/e din bibe.

Hinekane navê "serdema agahiyê" li vê dema ku em têt de ne, kirine. Hinek sedemên vê navlêkirinê hene, têt gotin ku êdî agahî sînoran nas nake, bi leza tirîşkan belav dibe. Lê ev aliyekî rastiyê ye, ji ber ku îro jî piraniya mirovahiyê ji mafên bingehîn bêpar e, di nava xizaniyê de, di bin zilm û zora kedxwaran de dinale. Her wi-

ha jî li welatê me şerekî qirêjî li dijî gelê me têt meşandin, gelek mirovên rewşenbîr ji ber bir û baweriyên xwe têtne girtin, heta têtne kuştin.

Rojnameya Azadiya Welat jî ku tekane rojnameya hefteyî ya bi kurdî ye li Tirkîya û bakurê Kurdistanê, ji zilm û zordariya kedxwar û mêtîngeran para xwe distîne. Bi awayên nerawe rêt li ber xurtbûna rojname têt girtin, li gelek bajar û navçeyên Kurdistan û Tirkîyeyê polîs bi darê zorê rojnameyan ji bayîyan distînin, nahêlin ku bigihîjin xwendevanan; belavkarên me têtne girtin, pest û pêkutiyê dibînin.

Digel van tiştan jî rojnameya me zimanê gelê kurd e, fêrgeha zimanê kurdî ye, bi sedan, heta bi hezaran mirov bi riya vê rojnameyê hîni zimanê xwe bûne. Lê ev ne bes e, divê hemû mirovên kurd ên welatparêz li zimanê xwe, li çanda xwe vegerin. Kesên ku dizanin bi kurdî bixwînin û binivîsin, mirovên din hîn bikin. Her wiha jî wekî nûçegihan û nivîskarên rojnameyê yên siruştî xwe bibînin, wisa kar bi-

kin. Ancax bi vî awayî digel bandorê piştaftinê (asimilasyon), tesîra bîrdoza rejîmê jî wê ji ser gelê me rabe, gelê me zêdetir bi xwe ve were, li doza xwe zêdetir xwedî derkeve. Her wiha bi xebateke wiha wê gelek nîrx û hêjahiyên gelê kurd jî ji windabûnê riha (xelas) bibin, wê gencîneya çanda me dewlemend bibe.

Xwendevanên hêja, bêguman, dê balawe kişandibe ku hefteya çûyî di rûpela 6'an de anketek hate weşandin, em bi vê anketê dixwazin dîtînan û ramanên we yên der barê rojnameyê de hîn bibin, ji bo ku em karibin rojnameyê xweştir pêşkêşî we bikin. Em ji hemû xwendevanên xwe daxwaz dikin ku vê anketê dagirin û ji me re bişînin. Ji bilî vê jî hûn karin bi riya nameyên xwe dîtînan û ramanên xwe li ser her mijarê ji me re bişînin. Li vir ez dixwazim rexneyekê li hinek xwendevanên me bigîrin. Em dibînin gelek name ji me re têtne ku têt de bi tenê bersiva xaçepirsê heye, bi dîtîna min ev kêmasiyek e. Di warê nivîsandina bi kurdî de hewla girtiyên azadiyê, hêjayî pesnê ye. Li aliyê din mirovên me ku bi kirdkî diaxivin, ji berê zêdetir nivîsan dişînin, lê ne bes e, em dixwazin zêdetir cih bidin nivîsên bi kirdkî û soranî, lewre rojnameya Azadiya Welat, rojnameyê kurdistanî ye.

Heta hefteyêke din bimînin di xweşiyê de, rojê şima weş bo, rojî êwe xoş bêt.

Heyanî mirinê bi armancê ve girêdayîn

MUCAHÎT SEVER

Mirovên ku bixwazin xwe bigihînin armancekê, pêwîst e ku heyani mirinê bi armanca xwe ve girêdahî bimînin û li gorî armancê xwe amade bikin. Armanca her kesî heye û di jiyane de karê pêk bê giş ji bo armancekê ye. Li rûyê dinyayê çiqas gel, civat û çîn hene divê armanceke wan jî hebe. Çiqas zanîn, fikrên wan hene wê giş di vê riyê armancê de bi kar bînin, ji bo ku bigihên mebesta xwe. Em bi kurtahî vê yekê bêjin, ku li cihekî an jî di nav gelekî de armanc tune be, di wê derê de mirov nikarin behsa pêşketinê bikin.

Di nav gelekî de, ji bo ku mirov xwe bigihînin armanca xwe, barê giran dikeve ser milê mirovan. Civak ji mirovan çêdibe, em nikarin mirovan ji civakê cuda bikin. Ihtiyaca civakê eger bi xelasbûnê hebe, divê di riya vê xelasbûnê de çî derfet û navgîn hene bi kar bîne. Ji bo vê yekê, ji mirov çî têt xwestin? Bi armanca xwe ve heya mirinê girêdayîbûn têt xwestin.

Dema mirov armancekê datîne pêşiya xwe, ji bo xwegihandina wê armancê pêwîst e ku plan û bernameyek were amaderinin û mirov li gorî wê bilebitin. Heke armancek li pêşiya mirovekî hebe, lê bêplan û bername, bêgirêdan be gihîştina wê armancê jî gelek zehmet dibe. Ji bo ku gihandina armancê, zanistî, bawerî û daxwaz divê. Lewre pêwîst e ku mirov xwe zana bike û bi pêş ve bixîne, bawerîya xwe xurt bike û di vê riyê de he-

Ji ber ku çûyina me ya nav şoreşê ne bi rengekî zanistî ye, bêhtir hewesa me ya sîlehê û gerîla me dixê dirûvê mirîdiyê. Dema mirov rastiyê dibîne jî, îcar şexsiyeta gemar û qirêj li pêşiya mirov dibe asteng.

ya dawiyê bi armanca xwe ve girêdayî bimeşe.

Her wiha divê kesê xwedî armanc zanîn û bi metodên zanistî xwe amade bike, li hemberî astengiyên herî mezin xwe li ser lingan bihêle û di riya armancê de tekoşîneke xurt bide, xwe li gorî wê amade bike.

Her wekî me li jor jî da zanîn, çiqas fen û zanîna mirova heye pêwîst e li gorî armancê li cihekî kom bike. Bo nimûne, hevalê Mazlûm û Kemal Pir, di Zîdana Amedê de, di mercên dijwar de, li hemberî zilm û zordariya dagirkeran li ber xe didin, bi xwe re jiyaneke bi rûmet û bilind derdixin holê; ev rewş jî, dide nîşandan ku girêdayîna bi bîrdoziya partiyê û armanca mezin ve, ew doz û armanc xurt kiriye. Mînaeke din jî hevala Bêrîtan e, ku bi bir û bewerîya sosyalîzma zanistî û ji ber girêdayîbûna bi armanca partiyê ve xwe ji zinar diavêje xwarê.

Girêdayîbûna bi armancê ve ji bo me li hemberî her astengiyê, xwe xurtkirin e. Dema em xwe xurt bikin serkeftin wê ya me be. Berî her tiştî emê giradayîbûna xwe ya bi riya azadî û serxwebûnê ya ku serokê neteweyî daye pêşiya me ve, xurt bikin. Ji ber ku em bi kemalîzmê hatine terbiyekirin, ev aliyê me yê ku bi şexsiyeta dijmin re tevlihev bûye, dibe asteng

li ber me. Heta ev bandora dijmin li ser me hebe, ne gengaz e ku em bi pêş bikevin.

Ji ber ku çûyina me ya nav şoreşê ne bi rengekî zanistî ye, bêhtir hewesa me ya sîlehê û gerîla me dixê dirûvê mirîdiyê. Di mirîdîtiyê de tu caran zanistî tune ye û dema mirov rastiyê dibîne jî îcar şexsiyeta gemar û qirêj li pêşiya mirov dibe asteng. Ev şexsiyeta hanê nahêle ku mirov li hemberî dijwariyan şer bikin; xwe ji fikrê herêmî, gundîtî û ahab-çawîştî xelas bikin.

Ji bo ku ev şexsiyeta li pêşiya me nebe asteng, lazim e ku em li hemberî wê şexsiyeta gemar, tekoşîneke pir mezin bidin û girêdayîbûna xwe bi armancê ve pir xurt bikin.

Mirov çiqas xebata xwe li gorî partiyê bimeşîne û daxwazên partiyê pêk bîne û bêtîrs bi ser proleman de biçe, ew qas serkeftin nêzik dibe. Wê demê mirov kare li dûv mezinbûna şer xwe amade bike. Roj bi roj fikr û ramanên xwe li gorî armancê ava bike.

Di vê encamê de mirov dikare bibêje ku armanc ji hêlekê ve sedema hebûna mirov bi xwe ye. Li nav zindîyan tenê mirov xwedî doz in. Ji ber vê yekê hebûna mirovekî bêarmanc, ne gengaz e. Ji ber ku armancê bigihîne serfiraziyê jî pêwîst e jiyana xwe li gorî wê saz bike.



İNSİYATİFA Jinan a ji bo Azadiya Leyla Zana, li Enqereyê bi çalakîyê berdane mebûsên kurd, bi taybetî jî ji bo Leyla Zana xwest. Jinên jî welatên cur bi cur di nava vê însiyatîfê de cih digirin. Wan heta niha çalakî li Kanada, Amerîka û li 11 dewletên Ewropayê li dar xistine. Rêveberiya çalakîyên Tirkîyeyê bi destê heyetekê tê meşandin. Daxwaza heyetê yê ji bo pêkanîna hevdiinan bi rayedarên tirk re bi ser neket. Kesên di nava vê kampanyayê de cih digirin didin zanîn ku her yek ji wan dixwaze rojekê ji dêla Leyla Zana di girtîgehê de razîn.



BARGEHA Navendî ya Femandariya Giştî ya ARGK'ê rapora şer ya meha sermawezê diyar kir. Di raporê de ziyana hêzên dewletê 379 (301 leşker, 68 cerdevan, 8 subay û 9 polis) kesên ku hatine kuştin û 104 birîndar (62 lib subay, polis, leşker û 42 lib cerdevan) hatiye nîşandayîn. Di raporê de li ser qezenc û windayiyên gerila jî tê rawestîn. Di vê mehê de jî 85 gerila hatine kuştin, 53 gerila jî birîndar ketine. Ji xeynî van jî 112 kes beşdarî nav refên gerila bûne. Di vê mehê de hêzên gerila 142 livbazî pêk anîne û gelek malzeme jî desteser kirine.

NÛÇE

Jêderka qirêjîyê şerê taybet e

Tesîra şerê qirêjî her roj bi awayekî derdikeve holê. Li gorî rapora GATA'yê kesên ku li Kurdistanê leşkerî kirine an jî dikin ketine nava nexweşiyên psîkolojîk ên cur bi cur. Her wiha nemirina sercerdevan xemgînî û tirs xiste dilê rêvebirên dewletê, niha nizanin ku çi bikin.

Q edera gelan bi encama şerê li Kurdistanê ve girêdayî ye. Ev yek her roj hê zelaltir dibe. Dengvedana bûyer Susurluk berdevam e, PKK'ê dilên di destê xwe de berdan. PKDW vediguhêze Parlamentoya Federalî a bakurê Kurdistanê û tê Kurdistanê. Ev sernavên hin bûyerên dawîn e ku rojeva Tirkîyeyê diyar dikin.

Dilên ku di destê PKK'ê de bûn jî hatin berdan. Mebûsê Partiya Refahê Fettullah Erbaş, Serokê Giştî yê İHD'ê Akın Birdal, Serokê Mazlum-Dera İzmirê Halit Çelik piştî ku leşkerên dil teslîm girtin ji bajarê Dihokê zivirîn. Ji doza ku Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê (DGM) der heqe wan de vekiribû, biryara beraatê derket.

Fetullah Erbaş di hin TV'yên tirk de diyar kir ku parlementerên şerxwaz bêfîkr û raman in. Ji ber vê ye ku ji bilî kuştinê tu çareyê pêşkêş nakin. Wî got: "Lê diyar bû ku, ev pirsîgîrêk bi kuştinê çareser nabe. Di vir de muhatap dîtin ne girîng e, lewre dema bê xwestin wê muhabat bê dîtin." Li aliyê din malbatên leşkeran kêfxweşiya xwe anîn ziman û piştevaniya xwe ji bo aştiyê heyeta aştiyê diyar kirin. Pîreka Tuncay Kavakhoğlu, Zümrüt Kavaklıoğlu kesên ku bi ser Fetullah Erbaş de diçin rexne kirin û xwest ku hem xwîn bê rijandin. Li aliyê din wê spasîyên xwe pêşkêşî PKK'ê kirin ji ber ku leşker berdane. Leşker hê jî di binçav de ne, tê gotin ku bi taybetî İbrahim Yayıralı dibe ku bê girtin. Digel vê hewayê aştiyê cendekên leşkeran ên ku ji Kurdistanê tên şandin her roj pirtir dibin. Hejmara dayikên kezêbşewitî zêdetir dibe.



Li aliyê din di hin rojnameyan de nûçeyên li ser Sendroma Vietnamê derketin. Di nûçeyê de behsa Rapora Akademîya Tendirustîya Leşkerî ya Gulhaneyê (GATA) tê kirin. Li gorî vê raporê kesên ku li Kurdistanê leşkerî kirine an jî dikin, bi nexweşiyên cur bi cur ên psîkolojîk dikevin. Rapor hejmara leşkerên Dewletên Yekbûyî yê Amerikayê (DYA) û leşkerên tirk ku bi nexweşiyê ketine dide ber hev, tê dîtin ku hejmara leşkerên tirk zêdetir e.

Rapor rêjeya (nisbeta) nexweşînan dide, li gorî raporê di % 27.8'ê nexweşan de ruhiyeta dij-civakî (antî-sosyal) hatiye tespîtkirin. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku leşkerên ku zindî vedigerin bi xwe re mirimê tînin, ji ber vê yekê mirin rojeva gelê tirk demakeve.

Tesîra şerê qirêjî her roj bi awayekî derdikeve holê. Di nav nîqaşên bûyera Susurlukê de kuştina Genaral Eşref Bitlis û Serkomar Turgut Özal jî hate rojevê. Li ser van mijaran tiştên ku nû tene ziman, di germahiya bûyeran de Serokê Giştî PKK'ê Abdullah Öcalan

anibûn ziman. Wê demê tu tişt nehate kirin. Ne tenê ev bûyer in, her wiha tiliya rejîmê di kuştina General Bahtiyar Aydın, Albay Rıvan Özden de jî heye. Bes dîsa jî kes bi biryardarî naçe ser van kuştinan. Li gorî rewşê îro raman ev e ku li Tirkîyeyê bi piranî siyasatvan û kesên ku xwe wekî rewşenbîr dihesibînin ji damezrandina kontrayê ne bêzar in. Ew bi taybetî li ser awayê bikaranîna van radiwestin. Jixwe gava ku sercerdavan Sedat Bucak jî bimira wê her tişt bihata veşartin. Nemirina sercerdevan gelek kes xemgîn kirin û tirs xiste dilê rêveberên dewletê. Niha nizanin ku çi bikin. Belkî ew bûyer ne qeza be jî. Tansu Çiller jixwe ji vê tirsê hema bi lez û bez çûbû Nexweşxaneya Çapa û Bucak wekî qehreman nîşan da.

Rastiya wê ji devê Türkes û Mahir Kaynak derket. Wan got ku ev suîqast e û bi mebesta kuştinê pêk hatiye. Ji ber ku wan kesan ji bo şerê qirêjî di gelek projeyên dewletê yê qirêjî de cih girtibûn û di vî warî de gelek tiştên girîng dizanibûn. Bes rêveberên dewleta

tirk hêdî hêdî dixwazin wê mijarê bincil bikin. Di vir de nifte nika di destê raya giştî de ye. Divê hemû aştxwaz heta dawiyê nehêlin ku ev mijar bê bincilkirin, heta ku hemû berpîrsên karên kirêt bînin darizandin.


Li aliyê din hefteya borî salvegera 48'an a "Hefteya Mafên Mirovan" bû. Di sala 1948'an de Yekîtiya Neteweyan biryar da ku roja 10'ê berfanbarê bibe destpêka Hefteya Mafên Mirovan. Ev hefte bi çalakîyên komeleyên mafên mirovan yê cur bi cur derbas bû. İHD'ê bi munasebta vê hefteyê Xelatên Aştiyê dan. Îsal mebûsê Refahê Fettullah Erbaş û Mazlûm-Derê û Eşber Yağmurdereli xelat girtin. Wekî din jî Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas xelata îsal da Işık Yurtçu.

Tê dîtin ku hêzên tarî, kirinên xwe yê qirêjî bi şerê taybet rewa (meşrû) nîşan didin. Lewre jî heta şer neqede, dawî li karên qirêjî nayê. Aştî îmkana herî mezin e.

EZNNAS MAYA

'Rola girîngtirîn a rewşenbîr e di nav millet de'

Tevî vê hevpeyvîna ligel Erdewan Têmûr dibe çar heb ên ku nûnerê me yê Sûriyeyê HELÎM YÛSIV bi berpîrsên weşanên kurdî yên li Başûrê Biçûk re kiribû em diweşînin, bi mebesta ku hem xwendevanên me bi wan bihesin û hem jî gelş û arîşeyên wan bizanibin.



Birêz Erdewan Têmûr, hûn dikarin bi çi awayî ji me re ji destpêka rojnamegeriya kurdî li ya Başûrê Biçûk vebêjin?

— Gava ku em li ser destpêka rojnamegeriya kurdî li parçeyê rojavayê Kurdistanê biaxivin, pêwîst e ku em ber çav bikin rola Komîteya Xoybûnê. Yekemîn car bû ku tîpên latîni û rêzimanê kurdî belav dibû, bi riya vê komîteyê û bi afirandina serokê wê Mîr Celadet Bedirxan. Lewma bîngeha hînbûna zimên li her gundekî kurdî ava dibû, bi alîkariya hevalên Mîr Celadet û rewşenbîrên kurd, wekî Reşîdê Kurd, Osman Sebrî û malbata Ekrem Beg û Qedrfî Can û hwd. Helbet di vî warî de rola Roja Nû û Harwarê nayê jibîrkirin.

Bi rastî ew gav bîngeheke yekemîn bû di dîroka milletê kurd de, ji ber ku millet bi zimanê xwe heye, tevî ku astengiyên wê qonaxê gelek dijwar bûn; çî ji layê nezaniyê ve û çî ji layê konevaniya rejîmê ve. Xebata Mîr Celadet û hevalên wî bû bîngeheke bicihkirina vê rêbaza ku berdewam kir sal bi sal ta ku bû movikeke bîngehîn di bernamêya hemû rêxistinên kurdî de? Ev yek bi xwe girîngiya ziman di nêrîna welatparêzên kurd ên li vî parçeyî de diyar dike.

Kovara Stêr çawa dest bi weşanê kir, hûn dikarin kurteagahiyekê der barê wê qonaxê bidin? Ligel vê, hûn rewşa weşanên kurdî çawa dibînin?

— Kovara Stêr kovareke wêjeyî, çandî, folklorî bû, di sala 1982-83'yan de hejmara yekemîn jê belav bû, bi xebata mamoste Zagros Hajo û Rizo. Heta niha 24 hejmar jî kovara Stêr belav bûne.

Helbet di gelek qonaxan re derbas bû. Ev qonax gelek dijwar bûn, çî layê çapkirinê ve û çî ji layê belavkirinê ve. Her wiha jî konevaniya şovenîst ku li ser milletê kurd berdewam e û ev jî rêbazek e ku ne tenê maf û zimanê kurdî qedexe dike, her wisa heta raman û navê kurdî jî hatiye qedexekirin. Tevî vê rewşa bi zehmet, kovara Stêr bi pêş ve diçû ji layê reng û naverokê ve, lê asteng ji me te-

van xurtir derketin. Lewre jî weşana kovarê hate rawestandî heta demeke li pêş, ku em karibin xelas bibin ji van astengiyên.

Di pêşiya astengiyên de yên mewdawî û çapê tîn. Hêviya me ev e ku em ka-

tevgerê çandî ya kurdî çêbûye; hêdî hêdî jî bi pêş ve dihere. Tevî ku rewşa me ne xweş e jî gelek layan ve.

Mirov kare astengiyên li pêşiya weşanên kurdî wiha rêz bike:

1) Nebûna azadiyê û demokratiyê, te-

Hemû asteng vedigerin li rêbaza şovenî ya rejîmê li ser milletê kurd, nemaze xwendina bi zimanê kurdî nehênî û qedexe ye. Lewre jî rewşenbîran tê xwestin ku rewşa milletê me binasin û destvala nemînin, divê xebatê bikin, ta ku karibin rola xwe li hemberî şoveniyên berdewam bikin û tevgera xwe ya çandî bi pêş bixînin û milletê xwe jî bêhtir hişyar bikin.

ribin di diwarojê de weşana kovara Stêr berdewam bikin. Em hêvîdar in ku îcar wê bêhtir serbixwe be û karibe bi alîkariya hemû rewşenbîrên kurd li parçeyê Rojava derkeve. Ji ber ku di roja îro de

vî ku rejîm çavên xwe carinan digire li ser belavkirina hin pirtûkên kurdî jî

2) Di vê rewşê de tu delîv (fersend) nîn e ku dezgeheke çandî çêbibe û ew bibe navgînê ku karê belavkirinê û çapki-

Erdewan Têmûr, di sala 1957'an jî dayik bûye û niha li bajarekî biçûk li rojavayê Kurdistanê dijî. Di bin akamiya Tevgera Azadîxwaz a Kurdî de hîni xwendin û nivîsina bi zimanê xwe bûye. Ji ber ku erka her endamêkî vê tevgerê hînbûna ziman bû. Di destpêka sala 1991'ê de dibe endamê komîteya amadekirinê û yek ji nivîskarên kovara Stêr ta niha.

Di dema dawî de ew rojnameyeke bi navê Deng û bi zimanê kurdî belav dikin ku ta niha jî berdewam e. Têmûr carinan kurteçîrokên bi zimanê kurdî dinivîsîne. Lê bi giştî ew gotaran bi erebî û kurdî dinivîsîne.

rîna pirtûkên rewşenbîrên kurd û danheva xebatên wan di rêbazeke rast û durist de pêk were

3) Ji ber ku karê çapkirinê belawela û bi rengekî nehênî (veşarî) çêdibe, gelek dirav lê diçe, ew jî rewşenbîran tengav dike.

Ev asteng tev vedigerin li rêbaza şovenî ya rejîmê li ser milletê kurd, nemaze xwendina bi zimanê kurdî nehênî û qedexe ye.

Lewre jî rewşenbîran tê xwestin ku rewşa milletê me binasin û destvala nemînin, berevajî wê, divê xebatê bikin û bêhtir xwe biwestînin, ta ku karibin rola xwe li hemberî şoveniyên berdewam bikin û tevgera xwe ya çandî bi pêş bixînin û milletê xwe jî bêhtir hişyar bikin. Ji ber ku di baweriyên min de rola rewşenbîrê girîngtirîn rol e di nav millet de.

Guhê jêkirî

Ev metelok, bûyereke rastîn e ku em tev tê digihîjin, jêkirina ser û guhan mîrate û meslekekî rayedarên tirk e û ji bav û kalên wan ji wan re maye. Xwedê hifza xwe ji wan bike!...

Di van salên dawîn de, di rojname û televizyona de li ser jêkirina ser û guhan gelek nivîs hatin nivîsandin û wêne hatin weşandin. Ez dixwazim li ser vê mijarê çend tiştan bînim ziman.

Ji sala 1971'ê heta sala 1984'an ez li gundê Ciqsê ku li ser navçeya Pasûrê ye, bûm. Min li wir zarokatiya xwe derbas kir. Li pişt gund çiyayekî bi navê "Omer" heye. Li wî çiyayî tu dar û ber nîn in. Lê li wî çiyayî sergeleke (keleheke) dîrokî heye. Li nav gund jî werz û bexçeyên avî hene.

Em tev dizanin ku dema li welatê me dibe êvar ji bo ku zarok rakevin, dê û dapîrên wan ji wan re meselokan dibêjin. A min jî welê bû. Dapîra min şevînan ji min re çîrok û meselokan vedigotin. Yek ji wan jî ev bû. Berî vegotina vê meselokê dapîra min ji min re wiha digot:

– Neviyê min, em û ermen li vî gundî me bi hev re jiyana xwe didomand. Têkiliyên me û wan gelekî xweş bûn. Me alî hev dikir. Dema me şiv bipata bangî wan dikir. Şin û şahiyên me jî tevî hev bûn. Em di gundekî de mîna xwişk û bira dijiyan.

Ez jê dipirsîm ew mirov çûne ku? Niha li ku derê dijîn?

Dapîra min, hema bi vê pîrsa min xemgîn dibû. Çavên xwe digirtin, devê xwe vedikir û bi qîr dest bi çêr û dijûnan dikir û digot:

– Neviyê min, ez çî ji te re bibêjim.

Çî ji Xwedê weşêrim. Min çî dîtibe ezê ji te re vebêjim. Dema şerê dinyayê (Şerê parvekirina yekem) dest pê kir, her roj gelek mirov (keç, kur, jin û mêr) dihatin kuştin. Di dawiya şer de gelê ermen têk çû. Piştî vî şerî tiştê ku leşkerên tirk anîn serê gelê ermen neyê serê dijminê me jî. Bi îşkenceyê keç û xortên wan li ber çavên wan dikuştin. Jinên wan li hev par dikirin, û paşê du rê didan pêşiya wan; an wan dê ola misilmaniyê qebûl biki-rana jî ew dê bihatana kuştin. Ji wan malbatan yekê misilmantî pejirandiye û niha ew li gund dijî. Em ji wan re debê-jin bavfile. Yên-din jî bi hovîti hatin kuştin.

Meseloka ku dapîra min ji min re vegotibû ev bû: "Ez rojekê ji çolê dihatim. Min dît ku apê min li kerê xwe siwar bûye û hinek mirovên ku nikarin bi rê ve biçin li kerê siwar kirine û ber bi min ve tê. (Apê min notirvanê gund bû). Gava ku hatin ber min, min ji apê xwe pîrsî:

'Apo, hûn diçin ku derê?' Apê min ji min re wiha got: Serleşker hetîye herê-mê, bangî van hevalan kiriye. Wî gotiye ezê bi wan re bipeyivim.' Lê tirs ketiye nava min, di mêjiyê min de tiştên nexweş derbas bûn. Kêf û eşqa min a dîtina apê xwe şikiya, apê min dît ku ez xemgîn bûm, ji min re wiha got: 'Keça min em niha diçin û piştî du saeten jî em dê dagerin.' Û em ji hev veqetiyên. Bû êvar min dît ku apê min ji çolê bi tena serê xwe tê. Min jê pîrsî: 'Apo ka hevalê te? Te çima ew jî bi xwe re neanîn? Tiş-



tek nayê serê wan?' Apê min gote min: "Keça min em çûn cem serleşker. Serleşker bi wan re qet nepeyivî. Bi çavên neyartiyê li wan dinêrî û ji leşkerê xwe re çav şikand. Leşker jî li ber ma li ber çavên me kêr û satorên xwe derxistin. Pêşî guh, difînî (poz) û lêvên wan jêkirin. Di dawiyê de jî serê wan jêkirin û ji hev re 'Ev tişt jî xelas bû' gotin.

Ez metel mam. Ev çî kar e?! Ev


bûyer, çawa dibin? Ev kar ne karê mirovan e. Ku li jor Xwedê heye ew dê çawa vê bûyerê bipejirîne..?

Ev bûyer, bûyereke rastîn e ku em tev tê digihîjin, jêkirina serûguhan mîrate û meslekekî rayedarên tirk e û ji bav û kalên wan ji wan re maye. Xwedê hifza xwe ji wan bike!...

ROBAR

Kabeya rewşenbîrên kurd

MEDENÎ FERHO



Nexweşî ji nişka ve bi tevzînokên dijwar dest pê nake. Pêşî binyata wê dest pê dike, piştî re rengê xwezayî diguhere, nawîskên biçûk ên bêtêhnik dest pê dikin. Dû re goşt pûç dibe, keza û avşolka xerabûyî dipingîhe, kêr, yanê zûxav di birnê de kom dibe; tevzînokên dijwar jê vedikevin. Hingî mirov dizane ku birn di laş de heye û li çareseriyên digere. Eger hekîmtiya kurmancî be, heger ya modern be, mirov dikeve nava lept û livandina çareseriyên. Helbet nexweşî ne bes birnê di laş de ne. Helbet ne nawîsk, qolînc û çirîskên tîr şewat in nexweşî. Cureyên nexweşiyên hene. Helbet nexweşiyên mezin, li gorî min du niş in. Yek jê ya mêjî ye ku dînbûn û tîredîntî ye; ya din jî psikolojîk e! Dabaşa me jî ev e. Nexweşiya psikolojîk! Tênegihîştin, nebaweriya xwe bi xwe..

Ev nexweşî jî cur bi cur in, pir rengên wê hene. Careke din dibêjim, li gorî min a herî balkêş a hewn (aqil) e!..Mirovên di binyata xwe de ne temam, karên ku dane ber her bêza xwe

pêk nayînin, dikevin nava perçiqandin û guwaştineke dil û mêjî.. Guvaştin û perçiqandin dilzarî ye ku her çar malik û guhikên dil karbendiya danîstandina xwîne nakin, ezayên laş di nava xwîna bê oksîjen de dimînin, dilewitin. Rawerîn û rabirîn dixitimîn, mirina fetsînakî dest pê dike. Roj li roja din mirov diwerive û xelas dibe. Guvaştin û perçiqandina mêjî, mirov ji rastiya mirov dûr dixê. Ker û lalî û ebkemî dest pê dike. Mirov bivê nevé dikeve ser şop û şivileyên din..

Hûrik hûrik nexweşiyekê dest pê kiriye.

Helbet di nava rewşenbîrên kurd de!..

Nawîsk û tevzînokên sedsala 18'an ku ekol û ramaniya hewngîriya klasîsîzma arkeolojî desk pê kiribû, lédixin. Goethe jî, di rêwingîtiya Romayê de tişt û alavên klasîk ên kevn berhev dike. Yanê di ber şibaya ramangîriya ekolê de ye. Îcar ê me ne.. Niha lêxistina tevzînok û nawîstan hûrik e û tu bandora wan li ser dil û mêjî tune ye. Bawer dikim ku nêzik ne dûr ev birn ê xwe diyar bike. Êdî karê me wê bibe gera li derman û hekîman. "Rewşenbîrên kurd, ku neçe Îspanya û Romayê nebîne, li nava avanî, kavî û hêrikên kevnare negere, nikare rewşenbîriya hemdemî bike û qayîşa rewşenbîrên cihanê bikişîne." Ev dîtî çar yekemîn li heywaneke sazîyek kurdî derkete hemberî min. Bi rastî devê min ma jî hev, çavên min beloq bûn. Xwesî di navenda zengelora min de rûnişt, neçû ne ez haet.. Ew qasî

jî dûrbûna ji rastiya xwe nabe.

Ji ber ku stana Kurdistanê ji serî heya binî di nava avanî, kavî û hêrikên klasîk de, ku tev ji mazmûr û sêklonên efsanewî yên kurdî dagirtî ne. Bi giştî li ser kevirên mîna qatorî bi hostenecariyê hewngirî, bi hişmendiyê dilovanî hatine kolan.

Heya îro jî berê rewşenbîrên kurd neketiye welatê wî. Piştî ew qas xwîn, tevgereke ku nûjeniyek bi xwe re aniye, ku bi navê şoreşê tê diyarkirin, hê jî berê me bikeve cihine din! Waweylê ye! Weytî ye! Şerm e! Dîrokvan û lêkolînanên ewrûpî ji Derya Spî û demedorên wê kirine benîşt û qazikên devê xwe û bingeha çanda xwe hemû li ser vê baweriyê ava kirine. Dibêjin Derya Spî bûye bingeha çandê.

Lê rastiyeke heye ku av ji derya ber bi bejê naherike û tiştê ber bi bejê hinagire. Her û her ji bejê ber bi deryan herikiye. Bi hezaran sal e ku Dicle û Ferat ber bi deryayan diherikin. Binyat û bingeha çanda Mezopotamya û demedoran di nava xwarûpêçkên çiyarêzên Kurdistanê yên ku mîna Haranê, Hesenkêf û Newala Bûnisra (ku Keliha Qeretacîdî û kevirê demhejmarê tê de ye, hê jî wî karî dike. Melayê nivro li gorî wî kevirê di taqê hêtê bircê de bang dike) û hwd. de ye. Wan kevz û qirş û qalên sereve gihandine deryan.

Helbet ku xwedî nebe, nav jî, rûmet jî çênabe! Kabeya rewşenbîrên kurd, stana tîrgorî ye, ne tu deverên din in.

Anketa xwendevanên Azadiya Welat

Hûn çend salî ne:

.....

Tehsîla we:

.....

Karê we:

.....

Hûn niha li ku rûdinin?

.....

Hûn ji kengê ve bi kurdî dixwînin?

.....

Hûn çiqas bi kurdî dizanin?

- Dixwînim
- Dinivîsim
- Hem dixwînim, hem dinivîsim

Zimanê we yê zikmakî kîjan e?

.....

Hûn ji kengê ve bi kurdî dizanin?

.....

Hûn ji kengê ve Azadiya Welat dixwînin?

.....

Hûn ji xeynî kurdî bi kîjan zimanên din dizanin?

.....

Hûn Azadiya Welat her hejmar dixwînin?

- Erê
- Carinan

Hûn Azadiya Welat bi çi awayî (ji ku) distînin?

.....

Hûn zimanê rojnameyê çawa dibînin?

- Hêsan (rehet)
- Dijwar (zor)

Hûn kîjan rûpelên rojnameyê dixwînin?

.....

Hûn pêşî li kîjan rûpelan dinêrin?

.....

Hûn kîjan rûpelan qet naxwînin?

.....

Hûn bi kîjan zaravayên kurdî çiqas dizanin?

- Kurmancî**
- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

Kirdkî (zarakî)

XWENDEVANÊN HÊJA

Di vê anketa me de du celeb pirs hene. Yên li ku hemberî wan an jî li bin wan cihê bersivê vala ye, ji bo dagirtina we ye. Cureya duduyan jî pirsên ku li bin wan çend bersiv hene, divê hûn çeperastekê (çeprazekê) deynin pêşiya yekê an jî çend heban ji wan. Bi saya vê anketê, em difikirin ku li gorî daxwaz, hêvî û rexneyên we kêmasiyên rojnameyê ji navê rakin û ji bo rojnameyê xweşik û hêjatir guherînên pêwist çêkin. Berî guherînan emê enca ma anketê jî pêşkêşî we bikin. Piştî dagirtina anketan, hûn dikarin rûpela anketê bibirin an jî fotokopiya wê bikişînin û ji me re bi lezginî bişînin.

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

Kurmanciya jêr (sorani)

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

Li gorî we zimanê kîjan nivîskarên Azadiya Welat sivik û hêsan

.....

Bi ya we zimanê kîjan nivîskarên me giran e?

.....

Hûn dixwazin di Azadiya Welat de kîjan nivîskar hebin?

.....

Li gorî we zimanê nûçeyên me çawa ye?

- Sivik e
- Giran e
- Baş e

Di rojnameyê de hûn pirtir kîjan nivîsan dixwînin?

- Ên li ser zimên
- Ên li ser çand û hunerê
- Nivîsên quncikan
- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsên mîzahî
- Nameyên xwendevanan
- Nivîsên ji bo zarokan
- Helbest
- Nivîsên lêkolînî

Ji van mijaran hûn kîjan qet naxwînin?

- Ên li ser zimên
- Ên li ser çand û hunerê
- Nivîsên quncikan

- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsên mîzahî
- Nameyên xwendevanan
- Nivîsên ji bo zarokan
- Helbest
- Nivîsên lêkolînî

Hûn xaçepirsê çêdikin?

- Tenê peyva veşarî dibînim
- Carinan çêdikin
- Her tim çêdikin
- Qet çênakim

Cihê ku em ji nameyên xwendevanan re vediqetînin:

- Pire
- Hindik e
- Baş e

Bi ya we zimanê Azadiya Welat bi giranî:

- Botankî ye
- Xerzankî ye
- Torankî ye
- Serhedkî ye
- Amedkî ye
- Kurdistanî ye

Hûn kîjan aliyên Azadiya Welat xurt (baş) dibînin?

.....

Hûn kîjan aliyên Azadiya Welat qels dibînin?

.....

Li gorî we nivîsên Azadiya Welat:

- Kurt in
- Dirêj in
- Baş in

Di Azadiya Welat de nûçe (xeber)

- Hindik in
- Pir in
- Baş in

Ji bilî Azadiya Welat hûn kîjan weşanan (rojname û kovar) dixwînin?

.....

Hûn kîjan weşanan dicibînin?

.....

Azadiya Welat gerek e:

- Dîsa hefteyî derkeve
- Bibe rojane
- Bibe duhefteyî
- Bibe mehane

Di Azadiya Welat de nivîsên bi kirdkî û kurmanciya jêr:

- Hindik in
- Pir in
- Bes in

Hûn dixwazin ku di Azadiya Welat de bêhtir kîjan mijar hebin?

.....

Hûn siyaseta weşana Azadiya Welat çawa dibînin?

.....

Di xwendina Azadiya Welat de çi tengasiyên we hene?

.....

Hûn bihayê rojnameyê çawa dibînin?

- Erzan e
- Biha ye
- Baş e

Ji bilî we çend kesên din ji rojnameya ku hûn distînin, îstifade dikin?

.....

Hûn rojnameyê ji maliyên xwe re dixwînin?

- Erê
- Na
- Carinan

Divê ferhengok di rojnameyê de:

- Hebe
- Tune be
- Hebe û cihê wê firehtir be

Raman û nêrînen we yên din hebin li jêrê binivîsin:

.....



●17. 12.1959

Di 17'ê berfanbara 1959'an de hêzên dewleta tirk bi fîdaya "cud-axwazî û ajantî"yê gelek xwendekar û ronakbîrên kurd girtin. Di dest-pêkê de hejmara wan çil bû. Di sala 1961'ê de hejmara wan gihîştê 49'an. Ji ber vê yekê jî ev bûyer wekî "Bûyera 49'an" tê bi biranîn. Her wekî wê demê, îro jî ji ber pirsgerêka kurdî gelek xwendekar û ronakbîrên kurd girtin, îşkence kirin û windakirin, di nav kesên ku di "Bûyera 49'an" de cih girtine yên navdar Musa Anter, Yaşar Kaya, Medet Serhat bûn.

● Berfanbar 1969

Kovareke bi navê Doğu (Rojhilat) dest bi weşanê kir. Di hejmara wê ya pêşîn de xwedî û berpîrsê kovarê M. Güneş Şahin e, di hejmara duyemîn de jî Kenan Mortan, Mehmet Sagay, Kabil Kocatürk ew kar hildana ser milên xwe. Li ser rûpela kovarê ya pêşîn nivîseke wiha heye: "Bijî biratiya tirk û kurdan!" Her wiha li ser kovarê nivîseke din jî heye ku xeta weşanê diyar dike "Kovareke antî emperyalîst, antî faşîst, antî asimilasyonîst, antî feodal û antî şovenîst e ku bi ronahiya sosyalîzma îlmî li ser meseleya rojhilatê disekine". Kesên wekî Musa Anter, Mihri Belli, Hasan Arfa, Atilla Tokatlı nivîskariya kovarê kirine. Ev kovar ji 32 rûpelan pêk ahitiye û salê carekê derketiye.

AWIR

Fîlmekî neo-kevnar!

"Eşkiya"



Ji aliyê nîrxandina naverokê ve, divê mirov li serê baş bifikire. Ji ber ku başbûn û nebaşbûn, hertim bi hêsanî ji hev nayên cudakirin.

Senaryo/gerinende: Yavuz Turgul
Eşkiya Baran: Şener Şen
Kejê: Sermin Şen
Cumalî: Uğur Yücel

Ev çend roj in ku di rûpelên çand û hunerî yên rojnameyan de îlaneke berfireh tê weşandin. Dema mirov li sernavê film dinihêre, mirov dibîne ku afîşekî xweşik û bedew hatiye amadekirin. Lê ji aliyê ve ditbarî ev xweşîkbûn ne pîvana xweşbûna film e. Ev rastî jî ji ber çavên gelek rexnegiran direve. Ji ber vê sedemê jî rexne cihê xwe yê rastîn nastîne. Êdî ev nîrx û raman dibin wekî pesnên ne li cih.

Ji aliyê nîrxandina naverokê ve, divê mirov li serê baş bifikire. Ji ber ku başbûn û nebaşbûn her tim bi hêsanî ji hev nayên cudakirin. Destnîşankirina vê rastiyê di hin bûyer û çalakîyan de hîn diwartir e. Fîlmê "Eşkiya" jî me dixê nava tengasiyê wisa.

Di fîlm de divê em li ser sê xalan bisekinin:

A pêşî, em dikarin bibêjin ku fîlm ji aliyê mantiq ve dikeve xeletiyeke mezin. Ji ber ku tu tîkîlî û elaqeya wê bi roja îro re nîn e. Eşkiya Baran (Şener Şen) li gorî senaryoyê di sala 1961'ê de li Çiyayê Cûdî di şerekî de ketiye destê leşkeran, lê belê em vî şerî di fîlm de qet nabînin. Lê dîtina me tenê ev e ku Baran tenê ji girtigehê tê berdan. Destpêk bi vî rengî ye. Belê ne xem e bila wisa dest pê bike, lê em jê haydar bin ku misyoneke

din em di serê xwe de li tiştan bar nekin. Wekî din bendav û gundê hilweşandî ku tîn ber çavên me, em ji dilgermiya xwe an jî ji xemgîniya xwe van planan wekî valakirin û şewitandina Kurdistanê dipejirînin û bi vî rengî dinîrxînin; ev jî şasiyêke mezin e.

Ji bilî van planan hin şasiyên meşhûr jî hene ku rexnegir ji van tiştan çawa bêhay dibin? Ma em nizanin roja îro dema kesek li rê, dirb, çiya û bajarekî Kurdistanê bigere, ne mimkûn e ku rastî tîmekî taybet, leşker, polis an jî cerdevanên destbixwîn neyê? Divê bê zanîna ku rastîya welatê me û gelê me ne wisa ye. Gelê me îro di bin zilm û zora hêzên fermî yê komara tirk de ye. Lê di fîlm de ew rastî berevajî bûye. Fîlm ji aliyê hunerî û teknîkî ve jî dikeve hin xeletiyan. Bi kurtasî em çend mînakên bidin: Carekê di kuştina Cumalî (Uğur Yücel) de xeletiyeke teknîkî û hunerî hebû; ji ber ku endamê mafyayê ku şesara xwe berdide Cumalî, gere ji hûrê xw birîndar bibûya; lê gava em wî li terasa apartmanê dibînin ew ji sîngê xwe birîndar e. Ew şaş e. A din jî di dema mirina Cumalî de rengê rûyê wî, rewşa saretê wî ne wekî yê kesekî ku li ber mirinê ye, bû.

Wekî encam, em dikarin bibêjin ku em bi giranî li ser xeletiyên fîlm rawestînin, lê tiştên xweşî hebûn. Bes, dîsa jî ev tişt fîlm ji neo-kevnariyê xelas nakin.

DÜZGÜN DENİZ

ÇAVDÊRÎ

AMEDTÎGRÎS



Dem û dezgeh hîmê dewletbûnê ne

Li gorî rewş û mercên siyasî bi du awayî dewlet tîn damezirandin. Yek, pêşî dewlet tîn damezirandin û pişt re jî bi alîkariya rejîm û dewletê yeko yeko dem û dezgehên neteweyî tîn avakirin. Bi rastî û di bîngeha xwê de heta dem û dezgehên neteweyî û demokratîk neyên avakirin an jî damezirandin, ew dem û dezgeh wezîfeyên xwe bi cih neyînin, mirov nikare jî şeklê wê dewletê re bibêje ku ew dewleteke demokratîk e. Helbet li gorî prosesa dîrokî jî ev tarîf tîn guhartin. Mebesta min li vir damezirandina dewletên nûjen û demokratîk e.

Riya damezirandin dewletê yek jê jî, di nav prosesa xebat û tîkoşîneke dîr û dirêj de li gorî pêwîstî û pêdiviyên dem û dezgeh tîn damezirandin û pişt re li ser hîmê van dem û dezgehên hîmê dewletê tîn avêtin. Ev jî li gorî xebat û hêza siyasî dibe. Dewletên ku bi vî awayî tîn damezirandin, ji aliyê siyasî, civakî û demokrasîyê ve hîn bêhtir bijûndar û jîndar in. Ji ber ku di damezirandina dewleteke wiha de zordestî û dîktatorî tune an jî kême e. Ew hêza xwe ji gel digire û dide gel. Dem û dezgeh ji aliyê gel ve tîn avakirin û bi alîkarî û piştgiriya gel jiyana xwe didomînin. Wê demê mirov dikare bipirse, ev dem û dezgeh çî ne ku ew qas di damezirandina dewletê û jiyana wê de girîng in? Belê, mirov dikare hinek ji wan dem û dezgehên wiha bi rêz bike:

Partî, enî û artêşa gelêrî, parlamento, kongre û konseyên neteweyî, sendîka, komele, federasyon û konfederasyon, dibistan, unîversîte, enstîtu, akademi, navendên çandî, weqf, pirtûkxane û weşanxane, muze, banka û medya ku radyo, TV, û rojname û kovaran digire nav xwe û hwd.

Mirov dema li dîroka Kurdistanê ya dîr û nêzik dinêre, mirov dem û dezgehên wiha nabîne. Du sedemên wê yekê hene. Kurdistan ji beriya Îsa ve bûye qada dagir û talana artêşên biyan. Dagirkerên ku desthilatdariya xwe pêk anîne, her tişt talan û wêran kirine û birine. Em dev ji dîroka kevn berdin, di ya nêzik de jî bîr û baweriyêke wiha nehatiye bîra serokên kurdan. Ew neteweyî û mezin nefikirîne. Yanê dewletbûn jî xwe re nekîrîne armanc. Hinek ji dema îslamiyê ve heta niha li Kurdistanê medresan wekî dem û dezgeheke kurdî didin nîşan. Ev ne rast e. Armanca medreseyan perwerdekirina dîniyê bûye. Ferqek heye ku ew jî di medreseyan de ji bo ku erebî hîn bibin, kurdî bi kar anîne. Ew qas. Ji medreseyan derketina hinek kes û melayên nîştîmanperwer tiştêkî din e. Di dema Mahmûd Berzancî û Qadî Mihemed de, xwestîne ku hinek dem û dezgehên kurdî ava bikin, lê mixabin jiyana wan salekê jî najotiyê û dijminên barbar ew tiştên heyî jî ji navê rakirine. Li Bakur ji sala 1984'an heta 1991'ê şer û tîkoşîna rizgariya neteweyî her ku çû xurt û geş bû û bi xwe re pêwîstî û divêtiya avakirina dem û dezgehên neteweyî anî rojevê. Pêşewayên şoreşê ew hewcedariya hanê di cih de dîtin. Hin li welêt, hin li metropolên Tirkiyeyê û hin jî li Ewropayê îmkânên damezirandina dem û dezgehên neteweyî çêbû. Bi damezirandin û xebata xwe re pêşî DEP'ê û pişt re jî HADEP'ê li Kurdistan û Tirkiyeyê balansa politîkaya Tirkiyeyê serobîno kirin. Li Stenbolê damezirandina Enstîtuya Kurdî, NÇM, Rojnameya Welat û Yeni Ülke û Özgür Gündem û hwd. bûn kelemên nav çavên dijmin. Dîsa bi damezirandina komele, federasyon û konfederasyonên wekî KOM-KURD, rêxistina rewşenbîran YRWK, Enstîtuya Kurdî li Berlînê, Akademiya Kurdî li Bonnê, vekirina ajansa DEM'ê li Almanyayê, damezirandina buroyên ERNK'ê, Heyva Sor a Kurdistanê, Damezirandina PKDW'ê, niha jî bi damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Yekîtiya Rojnamevanên Kurd, Yekîtiya Hiqûqnasên Kurd, Yekîtiya Mamosteyên Kurd, bi vekirina MED TV'yê û damezirandina Enstîtuya Kurdî li Stockholmê dem û dezgehên kurdan li seranserê Ewropayê reh û şax berdane erdê.

Mirov dema bi gelemperî li rewşê dinêre, baş dibîne ku ji çiyayên Kurdistanê heta Ewropayê dem û dezgehên kurdan pêk hatine û tîn. Ev hemû bi hev û din re xizmeta dewleteke kurdî dikin. Hem jî dewleteke bijûndar, jîndar û demokratîk!

Rola şanoyê, bi navê wê yê navneteweyî teatr, di qonax û merhaleyên şoreşan de hatiye îspatkirin. Şoreşa Oktobêrê ji vê yekê re nimûneyeke berbiçav e. Em kurt bibirin, şano wesîteyêke hişyarkirinê ya bitesîr e. Ji wan jêhatîtir ew e ku hay ji vê rewşê heye. Koma Şanoyê ya bi navê Can Şenliği, komeke muxalîf e li dijî vê pergala çewsîner û hay ji rola xwe heye.

SIRAÇ AKSOY li ser navê komê bi Müjdat Albak re axivî. Hevalê me ZANA FARQÎNÎ jî ev hevpeyvîna ku bi tirkî pêk hatibû, wergerande kurmançî.



'Tiyatro hewcedariyek e'

Wekî pirsar destpêkê hema em wiha ji we bipirsin û dest bi hevpeyvîna xwe bikin. Can Şenliği çi ye û ev koma şanoyê (tiyatroyê) çi dike?

Ev koma şanoyê di sala 1991'ê de avabûye. Ev komeke wisan e ku, xwe wekî namzet dibîne ji bo nimandîna (temsîlkirina) şanoya muxalîf a Anadolê.

Gava ku ev kom ava bû, bi şertekî derkete holê, şîra wê "şanoya zindî" (yaşayan tiyatroyê) bû. Bi gotineke din, wê şewê û awayên şanoyên heyî red dikirin.

Şano, ji merasîm û ayînên mirovên hoveber (îbtîdai) ên ku çandîni dikirin, derektiye. Ji wan ayînên wan ên ku ji bo zêdekirina ber û hilberînê çandîniyê li dar dixistin, zaye. Ew ayînên ji bo bereketê... Ev ayîn jî bi taybetî li Mezopotamyayê pir bûne.

Me ev ruhê şanoya ku ji Mezopotamyayê, ji Anadolê derketiye, dixwest. Ji ber vê yekê jî gerek me riya xwe ji riya şanoyên heyî, wekî yê dewletê, yê kesîde û taybet (xusûsî) ku ji derd û xemên îro bi dûr ketine, cihê bikira. Me riya xwe cihê kir û me xwe avête kuçeyan da ku em tim bi bîner û temaşevanên xwe re rû bi rû bimînin.

Kuçeyan, gavên me yê biçûk mezintir kirin, wan gavên me lezandin. Can Şenliği, îro şeş salî ye û wê ji sihî zêdetir listik pêşkêş kirine.

Me listikên xwe birin kuçeyan, qadên 1'ê Gulanê, me ew birin gundan, per û

guhên bajar (varoş û gecekonduyan); hema çi devera ku bê hişê we, em çûn wan deran. Bi ya me, diviyabû ku şano biçûya ber piyên temaşevan.

Diyabû ku me bi kesên bindest re têkoşîn bidaya, hem jî mil di mil de, diviyabû bû ku me şanoya xwe bi wan re hilberanda. Jixwe meseleya hîmî ji vir dest pê dike. Her wiha gerek e me şewê û teşeyên hilberînê yê di hundirê şanoyê de jî biguhartana.

Du hêmanên (unsurên) hîmî yê girîng hene: Yek listikvan û ya din jî bîner



Me ev ruhê şanoya ku ji Mezopotamyayê, ji Anadolê derketiye, dixwest. Ji ber vê yekê jî gerek me riya xwe ji riya şanoyên dewletê, yê xusûsî ku ji derd û xemên îro bi dûr ketine, cihê bikira. Me riya xwe cihê kir û me xwe avête kuçeyan da ku em tim bi temaşevanên xwe re rû bi rû bimînin.

e, yanê temaşevan e. Em lê xebitîn ku em van hêmanan bînin hemberî hev.

Me wekî koma hunermendên afirîner, hemû sazî û damezraweyên (muesesyên) di hundirê şanoyê de pelastin, rûxandin. Îro patronê Can Şenliği tume. Derhêner û nivîskarekî/ê wê jî nîn e. Ne dekorator û ne jî kostûmvanê wê heye.

Kom, bêyî ku di nav xwe de xwediyê cudahiyan hiyerarşik be, hemû tiştên xwe, bi xwe dike. Kom bi hev re hilberî-

nê (îstîhsalê) pêk tîne.

Em bi hev re listikên xwe dinivîsin. Em berhemên listikên xwe yê madî û manewî, li hev parî dikin. Dîsa jî, em bi hev re berdêl û gerewên ku ji ber pest û pêkutiyên dewletê çêdibin didin, her wjaha em bi hev re berdêlên ziyarên aborî jî didin.

Can Şenliği, şanoyeke welê ye, yanê şoreşa di her warî de, ji xwe re kiriyê armanc. Îmkanên çandî yê Mezopotamya û Anadolê û ji nû ve vejandina çanda zengîn a van cografyayan, ji me re bûye

Hûn profîla vê yekê çawa xêz dikin?

● Li hêlekê şanoyeke ku tîk diçe, hildiweşe heye û li hêlekê jî lebat û tevgerên ku bibin pêşengên ronasanseke li van xak û erdan heye.

Tiyatro, di destpêkê de wekî ku qedera wê bi şerên çînî (sînifî) ve girêdayî be derkete holê. Pêşî ji pergala cihanî re bû muxalîf, pişt re jî ji pergala ku kevn dibê re bû muxalîf. Gava em wiha li meseleyê binihêrin, em dê bibînin ku tiyatroya şerê çînî di hundirê xwe de nehewîne, sedemê hebûna xwe, berze û winda dike.

Îro aşîkar e ku divê mirov li van xak û erdan bibe terefek. Terefbûn jî, tê vê maneyê ku mirov divê nasnameya çandî ya Mezopotamya û Anadolê, zimanê gelê bindest, bi kurtasî bindestan biparêze.

Ev têkoşîn jî, divê tim û her gav, li her der û warî bê dayîn. Ez difikirim ku tiyatroya jî, yek ji wan waran e.

Em bi tiyatroyeke wisan re rû bi rû ne ku hildiweşe, bêbîner û temaşevan demîne, tiştêkî wê ye ku ew ji îro û dîrokê re bibêje nîn e.

Beriya 1980'yî, gelek şanoyên ku çalakîyên siyasî girtibûn ser xwe, hebûn. Me di her warên jînê de çalakîyên wan didîtin. Lê bi derbeyê re şanogeran (tiyatroyan) wekî ku her tişt qediyabe, hêdî hêdî muxalîfiya xwe winda kirin an jî bi awayekî zimnî, bi dewletê re li hev hatin.

Em ji vê rewşê re Ankara Sanat Tiyatrosu (AST), dikarin wekî nimûne bidin.

Îro şanoya ku tîk diçe û şanoya muxalîf li gel hev diji. An vejî an jî mirin.

aşkar e ku divê mirov li van xak û erdan bibe terefek. Terefbûn jî, tê vê maneyê ku mirov divê nasnameya çandî ya Mezopotamya û Anadolê, zimanê gelê bindest, bi kurtasî bindestan biparêze. Ev têkoşîn jî, divê tim û her gav, li her der û warî bê dayîn.

AST, yek ji wan tiyatroyan e ku alikariyên mezin ji dewletê distîne.

Di van demên dawîn de têkilî û pêwendiya wê ya ligel Efes Pilsenê ya madî, kiriye ku muxalîftiya wê bi temami bibe mijara gengeşî û nîqaşê.

Dostlar Tyatrosu, dîsa xwediyê muxalîfîyê nerm e, an jî ji bo ku eleqetî bi gels û arîşeyên îro yên cidî û jiyani nake, bi awayekî nerasterê be jî, dewlet ji rewşa wê razî ye.

Ji bilî van, em rewşa hunermendên ku beriya 1980'yî çûbûn Ewropayê û îro li welatê xwe fetilîne, dizanin. Em di nav wan hunermendan de, di warê tiyatroyê de, navên wekî Tuncel Kurtiz û Ayşe Emel Mesçi dibînin.

Van mirovan di warê sînema û tiyatroya siyasî de erk û vatiniyên gelekî girîng girtibûn ser xwe. Lê îro bi temami nasnameyên xwe yên muxalîf winda kirine.

Lingekî tiyatroya ku têk diçe û hildiveşe jî, "tiyatroyên burjuvazî" ne. Ev tiyatroya li dû pêwistiyan hunerî naçin, an jî ji bo ku pere qezenc bikin, tiyatroyê îcra dikin. Lewre jî ew nikarin ne ji bo îro û ne jî, ji bo seberoje riyekê vekin.

Gelek kesên mîna Ali Poyrazoğlu, Haldun Dormen, Cem Özer terciha xwe ji bo pereyan kirine, ne ku bi dîrokê re, bi huner û tiyatroyê re.

Lê beriya her tiştî, hunermendê tiyatroyê divê ji ezîtiya xwe azad bibe, ji ezîtiya xwe bifilite. Pişt re jî civakê serbest bike. Hunermendekî/ê ku bikeve vê qonaxê, bivê nevê dê bi dewletê re rû bi rû bimîne.

Ne demeke dirêj, çend sal berê li vî welatî ne zimanê kurdî, telafuzkirina peyva "kurd" qedexe bû. Ev lekeya ku malaştina wan gelekî zor e, li pêşiya hunermendan e.

Em di jîna xwe de gelekî girîngiyê didine pirtûk, rojname û televîzyonê, em bawer dikin ku dê tiştinan bidine me. Lê tiyatroya? Tiyatro çi dikare bide me? An jî rûyên ku em dê di wê de bibînin çi ne?

● Pirtûk û xwendevan bi tena xwe ne. Kesek, tişteke nakeve navbera wan. Temeşevan û televîzyon jî wisan in. Di wan û tiştên wekî wan de ferdiyetî derdikeve pêş. Lê di tiyatroyê de coşiya kolektîfî heye

Şano, berhema kolektîfî, bihevrebûnî û çalakîtiyê ye. Taybetiya herî girîng a şanoyê, kolektîvîzm e.

Gelê Anadolê tiyatroyeke ku bi navê "köy seyirlik oyunları" tê navandin, di dîlanan de, di şahiyên de dida jiyandin. Heta dehsal berê jî, ev kevneşop û adet berdewam bû. Lê ev kevneşopa deh hezar salî, di nav deh salan de heliya çû. Ev jî, ji dek û fenên çanda emperyalîst qewimî.

Mirov, ji ber ku ji wan re hate gotin ku ew dab û neritên (erf û adetên) wan ne heja ne û bi awayekî îdeolojîk hatin bawerkirin; lewma hejahi û nixên xwe yên çandî winda kirin.

Li ber televîzyonên xwe rûniştin û xweziya xwe bi wan mirovan ku di TV'yê de derdiketin anîn. Diviya wekî wan kinc li xwe bikirana, wekî wan rabûna û rûniştana, wekî wan bi hev re bidana û bîstandina, wekî wan vexwarina û bixwarina, bi kurtasî diviya bibûna mîna wan.

Mirov ketin wê rewşê ku êdî nikaribûn çirokan ji hev re vebêjin, di şûna ku kal û pîran ji zarokan re çirok û xeberokan vebibêjin, televîzyonan bi xêzefilmên (kartoonên) şerûd zarok vegirtin. Her tişt ji destê mirovên ku li ber TV'yê dibin robot, derket.

Em mecbûr in ji mirovan re vebêjin ku şano ne tenê ji bo temeşekirinê ye. Divê her kes karibe birame ku her kes dikare bileyîze. Eger mirovek dest bi vegotina çirokekê kiribe û wekî ku ji nû ve bûyer biqewimin, bîne ziman, wê gavê ji xwe şanoyê dest pê kiriye.

Mirovekî şanonas dibêji ku "Şano warê hevdiyetê, rûbirûmayîne" ye. Lewre, şano qonaxek e, merhaleyeke welê ye ku mirovên rûyên hev û din nas nakin, têne cem hev. Ev qonax li ber çavên mirovan, bi awayekî candar diqewime.

Ez dixwazim ji listikeke me ku ez qet ji bîr nakim, nimûneyekê bidim. Me heta îro ji ber gelek sedeman, li cihê cuda cuda, gelek listik ji gelê kurd re pêşkêş kirin.

Li Kirşehîrê, di şahiyekê de ku Musa Anter jî hebû, beriya ku listika me dest pê bike, em hatibûn ser sehneyê, em li sehneyê sekinandî bûn, 1500 kes rabûn ser piyan û dest bi rêzgirtinê (saygıduruşu) kirin, me ev yek dît. Navê listika me "Newroz" bû, em bi kinc û bergên sor bûn. Ji wan kirê em ew "çar can" bûn.

Ew 1500 kesên li wir, di rastiyê de li ser sehneyê çar mirov bûn. An jî Can Şenliği, komeke tiyatroyê bû ku ji 1504

beriyê her tiştî, hunermendê tiyatroyê divê ji ezîtiya xwe azad bibe, ji ezîtiya xwe bifilite. Pişt re jî civakê serbest bike. Çend sal berê li vî welatî ne zimanê kurdî, telafuzkirina peyva "kurd" qedexe bû. Ev leke ku malaştina wê gelekî zor e, li pêşiya hunermendan e.


kesî pêk hatibû.

Her wiha dîsa sê listikên me yên li Edeneyê tîn bîra min. Mêjû 6'ê adarê bû, mirov ketibûn qonaxa amadehiyên ji bo Newrozê. Ji sedî heştê temeşevanên me kurd bûn û yekemîn car dihatin tiyatroyê. Bi ser de gelek jê jî bi tirkî nizanibûn.

Cigare dikişandin, heta gelek şanoger naxwazin ku temeşevan li salonê tiştan bixwin, vexwin.

Gava li listika me temeşe kirin, tevî listikê bûn. Di listika me ya bi navê "Newroz" ê de axaftin hindik bû û ya heylî jî bi tirkî bû. Lê, me ji reaksiyonên wan derxist ku jê fêm kiribûn.

Eger ji pest û pêkutiyên li ber pêkanî-



na tiyatroya muxalîf bê behskirin, hûn dikarin çi der barê wê rewşê de bibêjin?

● Em dikarin bibêjin ku dewlet, derbarê wê yekê de hişyar e, bi baldarî û bi hesab nêzikî di meseleyê dide. Helwesteke wê ya wiha heye.

Heta hin îmkanan jî dide wan kesên ku xwedêgiravî wê rexne dikin. Mînak, Levent Kırca dikare rexne li polîsan bigire, lê ji ber ku ew rexne ne ew çend "tûj" in, polîs dikarin xelatê bidin Levent Kırca.

Wekî ku şanoger Can Yücel dibêje "Dev navêje hîmê pergalê." Şanoger, di

zandin (mehkemekirin).

Gava em dixwazin herine dever û bajar, asteng û dijwariyan ji me re derdixin; nahêlin em û bînerên xwe bêne hemberî hev.

Bi ya we şano çawa dikare ji wê rewşê bifilite? Komên şanoyê yên nû û temeşevan çawa dikarin "şanoya zindî" binasin?

● Îro pêwistî bi çalakîyê cidî û rêxistineke berfireh heye. Komên amator ên şanoyê yên Anadolê di tengasiyê mezin de ne. Sedemê wê rewşê jî ev e: Xweziya xwe bi şanoyên din tînin.

Beriyê her tiştî divê ew şanogerên amator ku xweziya xwe bi şanoyên dewletê û bi şanoyên taybet ên li Enqereyê tînin, li xwe vegerin, li rewşa xwe werqilin. Bizanibin ku şeweya hunerê, wê ji nav çanda wan bi xwe derkeve.

Du ling û piyên wê lixwewerqilîm û hayjixwe-hebûnê hene. Yek jî divê şanoyê wekî emrazeke (wesiteyek) xweîfadekirinê bi kar binin û ya din jî bi rîya şanoyê şeklek bidin dahatûyê, siberojê.

Bi zexmbûn û xurtbûna van her du piyan şano dikare rabe ser xwe.

Di serî de gerek bê zanîn ku, jiyaneke gelê Mezopotamya û Anadolê heye û ev jiyandî divê di berhemên şanoyê de bêne nîşandan. Ji bo wê yekê jî, pêwistî bi hezeke ku bibe pêşeng heye. Em listikvanên Can Şenliği, di vî warî de hin xebe-tan tînin pê.

Em bi gelek şanoyên amatorî û bi NÇM'yên Amed û Edeneyê re, têkilî datînin. Em bi hev re didin û distînin, agahî û tecrûbeyên xwe didine hev û ji hev re dibêjin.

Dûnahîk Rûpel 15

Gilokek agir

Gulokek agir
 Ji bo bîranîna Zîlanê
 Dema ku da rê
 Asîman çiksayî bû
 Serpêhatî weke guliyê hevrişimî
 Li paş xwe honand
 û çavên wê hûr bûn
 li ser xortaniyêke çargavkî.
 Stêr ji ber lingên wê şemitîn,
 nêrinên wê bahez çêkir
 Xweza pê xemilî...
 Gelek caran
 şevên tarî hûrik hûrik werivandibûn
 di berbangana de xewnên xweşik
 ji nêv dil bi dengê dîkan re
 li ba bûbûn.
 Xwest dilê xwe
 têxe tenûra li Herekol veketî
 da ku bi dilan re dilê wê bike
 gurpegurp..
 Tevzînokên polayî
 di demarên wê de herikîn,
 êdî xwîn rawesta
 evîne brûsk veda,
 berê xwe da
 nav refên siwarên hespên ji êgir,
 bêhn veneda
 bêhn neçikiya..

Bi lez, bi lez û bez
 weke pezkoviyekê berejor bû
 bûbû bazekî nêr
 jiyana ne kêr jê dûr
 û nêzî hemû xweşikahîyan.
 Ku dest dirêj bikira
 wê bigihîştî rastiyên elmasî.
 Gundiyên li kendalan
 nêçirvanên kewan
 paleyên li nav zevîyan
 lê nêrin û bi hev re gotin:
 Xwezî bi te, taca serê me
 xwezî bi te kewa gozel
 tu rûmeta çarenûsa me
 çirûska tariya tîr î.
 Li ser tenûran jin kelegirî
 bazirganê qoqan dev vekirî:
 Ev çi bû..
 Porê wê yê tenbûrî
 strana gel dilorand niha,
 hestiyên hûrbûyî -
 bûne tîrên bizotî
 di dilên tije guneh de.
 Zanim bi wê teqînê re
 Seyid Rizo hilçenî di gorê de
 sonda Nûrî Dêrsimî
 şax da di nav pirtûkê de..
 Baza evîndara bilindiyê



Portre: Resat Yusif

gulokek agir î tu
 digindirî, digindirî
 di paşla dîrokê de
 rûpelên berevaji-kirî
 werdigerinî kenê pitikan.

Baza di tenik û rûkulîk
 di bûkika çavên bi hêstir de
 tu sobaniyê dikî...

HESEN ZINAR

Ji helbestvanên nûhatî

Vê carê

Vê carê ku hatim çûna te,
 berî ku em
 di kendavên birînan de
 bin-av bibin,
 berî ku em
 di gerînoka pirsan de
 wînda bibin,
 min agahdar bike bo maçê...

Dîmen

Û gava ku
 mîna ocaxêke şermin
 serî hilda,
 di biniya mijankan re
 min didît
 çawa kulîkên evîne
 li ber saza arezûyê
 ser dihejandin.
 Û
 ji çavên wê perwaneyan
 keskemizgîn vedidan.

Rabûn

Ji min ve xuya dibe
 ezê rojekê rabim
 rabûna çiyayekî
 rabûna
 lehengekî efsanî
 cergên zorê biçirînim

çimkî ku min "qewlê"
 xwe di ketin û
 şî
 kes
 ti
 nê de
 kuta kiriye,
 û wisa ye
 rêpîvana dîrokê.

Raweyek

Gava tawankar tên û
 bi şûrên xwe
 çep û rast
 gerdenan dixilînin..
 gulistanên aştiyê
 xemgîn û bawî dibin
 û peyv li der barî dîmenê
 dibin mêşikine gurî
 di demûşa dirûşman de
 diçikilin

Naxwe

Wekî wisa ye ezbenî
 li gorî guviliya xwe dibûre
 naxwe
 ji mafê min e jî
 ku ez xewnên xwe
 di guldaneke de
 li ber serê xwe vêxînim.
 mafekî xwîristî ye.

Mûyek

Mûyekî xwe li serê pênuşa min
 dipêçand
 peyv di ber de dihiştin
 devê xwe lê ditewirand
 û digot;
 Ez im hawara
 guliyên kejšorî
 ji padişaha hestiyar
 ji nav destê generalan
 revyayî me
 hatime da ku dildevî
 çixara xwe
 ji bejna min pêxinin
 êşa min bikêşinin
 Ji yaran re
 çîroka evîna min
 binivîsinin

DILDARÊ AŞTÎ/
 QAMÎŞLO

Evîn

Du evîndar
 ji hev dûr ketin
 her yekî ji wan
 bi xwe re bir
 hingivê lêvan,
 nameyek,
 guleke çilmisî
 û dilekî
 şewitî...

JANA/
 AMÛDÊ

Çar helbest jê re...

I
 Dema dawiya evîne
 di dilan de
 tê..
 Şahî dimire
 Gul stûyê xwe xwar dikin
 û cîhan tev digirî..

II
 Dema tu min
 dihêlî û derî
 gulên te diyarî min kirine
 diçilmisin..
 pelên daran diweşin
 û payîz zû tê

III
 Dema li hêviya te
 dimînim
 û tu nayê;
 şev dirêj dibin.

IV
 Dema
 ez di şevê de digirîm
 ez ji te nefret dikim
 Lê weke zarokeke biçûk
 li te vedigerim
 ta bêjim ez ji te hez dikim
 tevî çemê hêstiran

CÎHAN BILAL/
 EFRÎN



Li navendên çandê çalakiyên ve hefteyê

Li Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) şaxa Stenbolê

● 15.12.1996 **Yekşem**: Konsera Bilgesu Erenus, saet:14.30

"Dîwana Dengbêjan", saet:17.30

● 18.12.96 **Çarşem**: Gotûbêj: Afşar Timurçin "Huner û Estetîk"

saet:18.00

● 20.12.96 **În**: Fîlm: "Welat û Azadî", Ken Loach, saet:18.00

● 21.12.96 **Şemî**: Konsera Grup Güneşe Türkü, saet:14.30; Teatra

Jiyana Nû, "Deweya Generalê Teneke", saet:17.30

Li NÇM'ya Îzmîrê

● 18.12.96 **Çarşem**

Panel: Nasir Söylemez (DBP), Mehmet Tekin (HADEP), Şerif Karakurt (ROJ) "Rûdanên Ramyarî û Partiyên Siyasî", saet:18.00

● 20.12.96 **În**: Konsera Koma Agirê Jiyan, saet:18.00

● 21.12.96 **Şemî**: "Şeva Piştigiriya Xwenedekaran",

Koma Agirê Jiyan, saet:17.30

Li Evrensel Kültür Merkezi

● 15.12.96 **Yekşem**: Semîner: İhsan Çaralan, Zihni Anadolu "Li

Tirkiyeyê Têkiliyên Sosyalîstan û Çîna Karkeran", saet: 15.00

● 16.12.96 **Duşem**: Fîlm: Dijmin (Düşman), Y.Güney, saet:17.00

RÛDAN

Li Helebê şevbuhêrka çîroka kurdî

Çîroka yekemîn li "Benda Mirinê" ya Suut Kılıç bû. Ji ber ku nivîskarê ve çîrokê bi xwe ji bakurê Kurdistanê ye, çîrok wî ji aliyê Jan Dost ve hate xwendin. Ev çîrok li ser kuştinên failê neçhûl ên li bakurê Kurdistanê ye.



Roja, 6.12.1996'an li Helebê, Koma Xanî, şevbuhêrka belavkirina xelatên pêspaziya çîrokan li dar xist. Nêzikî 45 rewşenbîr û nivîskarên kurd beşdar bûn. Pêşî her sê çîrokên pêşbir hatin xwendin. Çîroka yekemîn li "Benda Mirinê" ya Suut Kılıç bû. Ji ber ku nivîskarê ve çîrokê bi xwe ji bakurê Kurdistanê ye, çîrok wî ji aliyê Jan Dost ve hate xwendin. Ev çîrok li ser kuştinên failê neçhûl ên li bakurê Kurdistanê ye. Nivîskar bi zimanekî estetîk psîkolojîya insanên kurd li hemberî mirinê ne zimên. Her wiha ew hevnegirtina çîrovan jî bi awayekî edebî rexne ke. Çîroka duyemîn "Çîrok pêncan"

a. Fawaz Ebdî û çîroka sêyemîn çîroka M. Hemo ya bi navê "Hêsir" bû.

Di dawiyê şevbuhêrkê de biryar hat dayîn ku her sal roja 7'ê berfanbarê wekî "Roja Çîroka Kurdî" were pîrozkirin. Di vê şevbuhêrkê de Ehmedê Çep bi bisqa xwe û Miço Kenes jî bi dengê xwe çend stran pêşkêş kirin.

Pişt re jî Helîm Yûsiv û Pîr Rustem, her yekî çîrokeke xwe xwendin û bi belavkirina xelatên dawî li şevbuhêrkê hat.

Wekî tê zanîn Koma Ehmedê Xanî li Başûrê Biçûk pêşbazîya çîrokan li dar dixê û şevbuhêrkên wêjeya kurdî pêk tîne.

AZADIYA WELAT/ HELEB

Hêvî li çiyayên welatê lelekiri

Ji bin berfê derketibû...

Te jî xwe li wê girt.

Ligel wan xweş-mirovan

Tu jî bûyî stêr

û ji spikaya çavên me xuricîy

Di berfanbara 1991'an de li Kampa Çiyayê Spî bi 12 hevalên xwe re, di oxira welatê gelê xwe de serî danî.

Zana Farqînî



M. MİRZE BİLGİÇ (TİRÊ)

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Dîroke ra yew rûpele

M. Kemal 23.12.1919 de şano tekeya bektaşîyan. Postnîşt Cemalettîn Çelebî cem girê dano M. Kemalî ra şîmşêr girêdano û nê gêno raye. C. Çelebî zernanên ke teka de estê seba şerî dano M. Kemalî.

20.12.1920 de postasê Sêwaz- Kangal-Divrixi Duruca koyanê de hetê aşîreta Canbegan ra eno vindarnayene û Midûrê Postî Aydoğan Mustafa êno kîştene. Naye ser ro qaymaqaymê Divriyê ebi îdiaya ke pê nê karî de Baytar Nûrî esto, ê dano guretene.

Aşma 12'îne seba êzdîyanê ke ewro hama hama qedîye, amê çîne kerdene, aşmêde bimbarek a.

Hîrî çiyî dîrokî, hîrê çiyêke biyê û xebera dînan yewbînan ra qe nêbiya. Hîrmîn çî jî dîroka kirmanan can de kemerê bînge yê.

M. Kemal qey şîyo tekeya bektaşîyan? Her çî ra ver nê mordemekî azadbiyena yan jî azadkerdena halîfe î pâyser ardena şerîatî waştêne Erzîrom de! Se bî ke, mordemoke şerîat, hîlafet wazeno, şono lewê Bektaşîyan. Cewabê naye dîroka osmaniyan de esto. Mordemê osmaniyanê xasî devşîrme biye. Ma çînay re bektaşîyan hetê M. Kemalî kerd. Cewabê naye jî dîroka Osmaniyan de esto. Demoke osmaniyan kirmancî, qizilbaşî kîştêne, qir kerdêne, bektaşîyan seba osmaniyan her hetê dinya de şîmşêr hejînê, şarê bînî kerdêne binê bandîro osmaniyan. Na bewarîye no karê xo, hem jî hemverê hembawervananê xo hetanî ewro ard. Ganî na yewe/ jûye rind bêro diyene û şînasnayene.

Sebeb çik bî, ke aşîra-Canbegan serê tepîya erîş berd postî ser û midûrê de kîşt? Cewab zaf zelal û eşkera wo. İnan waştêne ke wayîrê heqa xo, wayîrê zonê xo, welatê xo û bîrûbawarîya xo bê. Ebi nê erîşî şerê Koçgîrî dest bi karê çekdariye kerdo. Ū se ke êno zanayene, dawîya nê erîşî ebi sere wedardayena Koçgîrî berdewam kerdo. Na ca ferqa bektaşîyan û tirkanên qizilbaşan/ alevîyan gelê girs a. Bektaşî lewê zulîmkaran de, lewê duşmananê bawerîyan û şaranê bînan de ca gureto, la belê tirkanê alevîyan/qizilbaşan hemverê nê zordaran û na zordariyê lewê kirmancan de ca gureto. Ganî na yewe jî rind bêro zanayene. Nê hurdmîn biyenî yewbînan tamam nêkene, la belê hemverê yewbînan vecîne. Ganî na ca mordem, angêro kesîti, şexsiyet û bawerîya xo, çayê xo bigêro. Aşma bimbareke ya êzdîyan de biyenê corênî biyê. La belê kesî nêzanîto, ke na aşma aşmêde bimbarek a. Haya dînan jî êzdîyan ra çîne biya û eke biya jî ebi verhukman biya.

Ewro teberê welatî de bo jî xebera kesanê ma yewbînan ra esta. No çiyê de dîrokî yo. 6'ê aşma bimbareke de roşana rakerdana çayê karê min "dukanê domana" bî. Na roja bimbareke de ma îmkân dî, ke roşana şarê manê êzdî, pîroz keme. Şarê ma jî îmkân dî, ke xo eşkera, bêtêrs biyoro re zon.

Dem vardo ra, şarê ma biyo heşar, yewbînan ra ebi hay o. Ha welat de, ha teberê welatî de nêzdî re yewbînan biyo. Zê seranê 1919-1920 yewbînan ra bêhay niyo. No heşê yewtiye wo. Ganî na yewe jî hetê ma ra rind bêro zanayene û ma çayê xo bigêrîme. Ebi na heşariye û haydarbiyene ez roşana şarê êzîdiya pîroz kena.

Cinawira mê

Rojekê şêr li daristanê dikeve xewê, xewa kûr û bêbinî. Zarokên wî dimînin bêxwedî, perîşan û pergende li ber çavên cinawiran.

Cinawir li hev dicivin û dibêjin:

– Va ye şêr razaye, ketiye xewa giran û kûr. De werin em bibin yek. Her çî deverê ku di bin destê şêr de ne, emê jê bistînin û têjikên wî jî bixwin.

Cinawirên di civînê de gotinên xwe dikine yek, li ser biryaran li hev tîn û dest bi xebatê dikin. Cinawirên hov û har yekîtiyê pêk tînin û bi rê dikevin. Her erd û deverên ku di bin desthilatdariya şêr de bûn, jê distînin û dagir (işgal) dikin. Zarokên şêrê belengaz hinek dîl têne girtin, hinek jî diqêştin; ji hev belawela dibin. Hinek ji zarokên şêr têne kuştin, hinek jî dîltiyê qebûl nakin. Lê jiyanekê bi feqîrî, belengazî û di bin ketek û zordestiyê de derbas dikin. Carinan li hev dicivin, civînan çêdikin, da ku ji halê xwe re çareyekê bibînin û ji bin nîrê zordestiyê xwe rizgar bikin û bigihîjin jiyanekê serbixwe. Yek ji zarokan rojekê debêje:

– Tenê çareyek heye. Ew jî hişyarbûna şêrê mezin e. Gerek e şêrê mezin hişyar bibe...

Zarokên şêr yên din dibêjin:

– Rast e. Tu rast dibêjî. Ger şêr hişyar nebe, rizgariya me nabe. De rabin em herin şêr ji xewê hişyar bikin.

Diçin li ber piyên şêrê mezin mîrê çiyay û daristanan dikin qîrîn, hawar dikin. Şêrê mezin bi çavên melûl li dor-hêla xwe dinêre.. Belê, xewa giran, xewa hezar salan, xewa bindestî û koletiyê; xewa belengazî û jartiyê. Şêr dibîne ku, zarokên wî stûxwar, tazî, pêxwas, birçî û belengaz in. Li hal û dewala wan dipirse, zarok yeko yeko çî ku hatiye serê wan ji şêr re ta bi derziyê vedikin û dibêjin. Piştî ku şêr meseleyê fêhm dike radibe ser xwe û dest diavêje sûr û mertalên xwe û rext û fişekan hildigire û derdikeve deşt û çiyay, gelî û newalan, li sûk û bajarayî kolan bi kolan digere. Mebesta wî ew e ku hemû şêran bigihîne hev, di nava wan de yekîtiyekê ava bike û ji zarokên şêran re welatekî serbixwe û azad ava bike.

Bi zor û zehmetî rêxistînekê di nav şêran de pêk tîne û bi xwe jî serokatiya şêran dike û li dijberî cinawiran dest bi têkoşînê dikin. Lê gava ku şêr amadekariyên têkoşînê dike, dibîne ku zarokên şaristanê pqrçe pqrçe bûne, di nava xwe de bi hev ketine, hinek ji wan bûne olpe-rest, hinek jê bûne paşverû, hinekan jî xwe spartiyê cinawiran, hin bûne bira-kuj. Dema ku şêr vê rewşê dibîne tê cem hevalê xwe û dibêje:

– Ez gelek geriyam. Min dît ku rewşa şêran ne baş e. Bi halê wiha xerab bi wan re hevaltî nabe. Lê ez bawer dikim ku em dest biavêjin şoresê wê hevalên



me zehf çêbibin. De ka lez bikin em rabin... Di bin serokatiya şêrê mezin de şêran dest bi şer kirin. Roj bi roj şêrê şêran xurt bû. Cinawir mabûn heyirî. Di nav xwe da digotin:

– Gelo me nizanî ev kî ne li me dixin ev kî ne yên ku wiha em bêçare hiştine. De rabin herin serê wan jêkin û werin.

Cinawir dema ku diçin bala xwe didinê, bavo çî bibînin. Şêrê mezin daye pêşiya şêran û halanan radike. Şêr gelekani ji cinawiran dikujin. Yên ku dimînin derrevin têne cem cinawirê mezin gurgepîr, dibêjin:

– Ey cinawirê cinawiran, serokê me gurgepîr, wele şêr in, şêrê mezin hişyar bûye û daye pêşiya şêran. Gelek ji hevalên me hatin kuştin, yên mayî jî nîv-mîrî ne. Me jî xwe bi zor xelas kir.

Gurgepîr gazî dike hemû cinawiran, civînekê çêdikin, bi hev dişewirin û dibêjin:

– Li dijî şêran divê em ji cîranên xwe alîkariyê bixwazin.

Cinawir bi alîkarî û piştevaniya cîranan demeke din jî şer didomînin. Lê dibînin ku bi vî awayî jî nikarin bibin serî. Cinawirên ku alîkariyê pê re dikin ew jî destê alîkariyê dikişînin. Dibêjine wan ku bi vî awayî nikarin bi ser bikevin. Dîvê ku ew bi şêran re aştîyê deynin. Yan na ew dê têk biçin. Şêran jî baş fêhm kiriye ku ne bişer be cinawir ji xaka wan naçine der, ji aştîyê tu tiştêkî fêhm nakin û xwarina wan goşt û xwîna şêran e. Şêr jî bi hev dişewirin û dibêjin:

– Girîng e em jî li derfetan mêze bikin.

Cinawir bê şer ji tiştêkî fêhm nakin. Lewma pêwîst e em şer hîn xurtir bikin. Cinawir dibînin ku nikarin ji bin barê şêrê bi şêran re rabin, di nava xwe de dibêjin:


– Gerek e em serokê xwe biguherînin. Heta niha cinawirê mêr gurgepîr bû serokê me. Em bi ser neketin. Niha divê em serokeke mê bineqînin. Ji bo serokatiyê baştir dêlegurg e. Lewma em dê dêlegurgê bînin ser kar.

Cinawir biryarê distînin. Dêlegurga spehî û zerik dikin seroka xwe. Fikra dêlegurgê jî ew e ku şêran bi dek û dolaban bixapîne û bixe dafika xwe. Lê nikare. Dêlegurg bi alîkariya cinawirê hov û har, gurgê devbixwîn çî diviya dikir. Lê li himberî şêran nikaribû bi ser bikeve. Şêran her ku çû şer mezin kirin, şêrê azadiyê, şêrê jiyanekê serbixwe û li ser xaka welatê xwe...

Şêrê di navbera şêr û cinawiran de hîn berdeham e. Lê êdî cinawir nikarin mîna berê şêran bixwin. Niha jî cinawiran dest pê kirine têjikên (çîlikên) xwe dixwin. Şêr jî li wan dinêrin...

– ŞEHABETÎN BILBIL

Xwarinên Kurdî



çav kir, ez gihîştim vê baweriyê ku nivîskarên vê pirtûkê kesine welatperwer û pêjinker in.

Çimkî, ev dema ku gelê kurd tê re derbas dibe, zor û dijwar e. Roj nîn e ku gundên kurdan nayên şewitandin. Bêguman şewitandina her gundekî nemana ked û berhemên hezaran salan e.

Di delîveyên wisa de her tiştêkî ku li ser kaxizan neyê nivîsîn, bêguman di pêvajoya jiyandê de hêdî hêdî wê bêne jibîrkirin û namînin. Evê xebata ku Bavê Şilêr û Bavê Zozanê kirine, ji bo her lawekî kurd ê ku destên wî qelem digire, nimûneyeke hêja ye. Vêca ev pirtûka ku ji layê Bavê Şilêr û Bavê Zozanê ve hatiye amadekirin û bi pêşgotina

Pirtûkek bi navê "Xwarinên Kurdî" di befranbara 1994'an de, li Başûrê Biçûk î Kurdistanê hatiye weşandin. Ji ber bipêşde çûna teknolojiyê bi lez û bez û ji ber rewşa gelê kurd a bêserûber ku îro naçar û nikare kelepora xwe biparêze, rewîşt û gerdişên kurdewarî roj bi roj tene jibîrkirin û ber bi winda bûnê ve diçin. Piştî ku min ev pirtûk ber-

Konê Reş hatiye xemilandin, digel şirovekirinê ku ji danasîna 55 xwarinên kurdewarî pêk hatiye, di baweriyaya min de, li pêş ronahiya vê bîr û baweriyaya dilovan a neteweyî hatiye amadekirin. Bi kurtayî, ev pirtûk navgîneke sereke ye ji bo kîlêra hemû kevaniyan.

DILDAR ŞEKO



Nûbihar

Di vê heftiya rabûrî de, kovara Nûbihar ku mehnameyê çandî, hunerî û edebî ye, bi hejmara xwe 46'an ya heyva tîr-mehê derket pêşberî xwendevanên xwe. Mehnameya Nûbiharê ya ku xwerû bi zimanê kurdî derdikeve, bi naverokeke tîr ku ji gelek babetên balkêş û rengareng pêk hatiye û bi hevypeyvîn, çîrok, helbest û zargotinan hatiye xemilandin. Hêjayî gotinê ye ku di hevpeyvîna vê hejmara Nûbiharê ya ku der barê her du "Seîdan" (Şêx Seîdê Kurdî û Şêx Seîdê Pîranî) de bi A.Melik Fîrat re hatiye kirin, li ser hinek agahiyên ku di mêjûya me ya nêzîk de li tariyê mabûn, xwendevanan serwest dike.


Razî dil

Ev namilkeya helbestî ya ku ji 24 helbestên kurt û dirêj û ji sê beşan pêk hatiye, bi kurmanciya jêrin (Sorani) hatiye amadekirin û yê helbestvanê hêja Peşew Merîvanî ne.

Beşa yekê helbestê yê ku bi bi devoka soran hatine nivîsîn, klasîkî ne. Beşa duwemîn bi devoka Hewramî hatine honandin. Beşa sêyemîn jî helbestên bi sermavê 'Çarînekan' hatine rastin. Piraniya van helbestên Peşew Merîvanî ku duwemîn car ji lay Weşanxaneyê Sara ve bi tîpên erebî û latînî hatine çapkirin, ji destpêka salên

1970'yan û vir ve jî layê helbestvan ve bi naverokeke neteweyî hatine rastin û berî 1985'an bi pêşgotina helbestvanê hêja Hêmin Mukriyanî carekê hatine çapkirin.


Hêjayî gotinê ye ku bêhn û çêja Goran û Qani' jî helbestên Peşew Merîvanî xweş tî.



*Her çend dekem ewey ke le dilim daye
Bixime ser nûkî qelem bom naye
Her çend dekem derî nabirê zimanim
Ewey diboxî ewê wekû giyanim
Her çend dekem ténagem bo çî awa
Lale ziman le wey dilhestî deka
Min ke bom dernaxirê hestî derûn
Çibikem ger danerêjim eşkî rûn*

Nobedarên kulturê

DILBIXWÎN DARA



Di vê dema dawiyê de, gelek kovar bi gelek navan bi zimanê kurdî tene weşandin.

Hem li welat hem jî li derveyî welat, xebateke wisa mirov kêfxweş dike. Her çiqas weşan û berhemên bi zimanê kurdî zêde bibin, ew qas jî çand û hunera me dewlemend dibe û kultura me bi pêş dikeve. Tiştê jî dest mirov were ev e ku mirov piştigirîya wan weşanan bike û ji wan re bibe alîkar.

Vê dawiyê kovareke ku parastin û pêşxistina çand û hunera kurdî ji xwe re rêber dibîne bi riya hevaleyê kete destên min. Ez dibêjim bi riya hevaleyê, ji ber ku ew tenê di destê aboneyan de dihate dîtin. Piraniya kovar û weşanên me yê bi kurdî wisa ne, tu tenê dikarî wan di pirtûkxaneyên abonayên wan de bibînî, wekî din ne mimkûn e ku di nav gel de werin xwendin, an jî sînorê taxa ku tê de tene weşandin, derbas bikin.

Mixabin... Belê mixabin... Wekî din ez dikarim çî bibêjim! Bila vê carê jî wisa be. Em bi mixabin dest pê bikin "Çima?" hûnê bipirsin. Ji ber gelek sebeban mixabin...

Ev kovar jî wekî gelek kovarên mîna wê -nav pir ne pêwîst e, ku gelek saf in li derveyî welat tene weşandin, sînorê çend xwendevanên abone derbas nekiriye, tenê di nav çend destan de geriyaye. Her wiha di hemû hejmaran de jî, tu

tenê dikarî navê çend nivîskaran bibînî. Ew jî nivîskarên "ji malê ne". Rojek were emê navekî "xweşik" li wan kovar û nivîskaran bikin.

Min hemû hejmarên vê kovarê dane hev, bi meraq ez di nav rûpelan de geriyam, lê belê di dilê min de bû hesret ku ez li gotineke wekî "gerîla" rast werim. Eşkere bibêjim, di dilê min de bû hesret ku çîrokekê li ser qehremaniya gerîlayekî PKK'ê bibînî. Di dilê min de bû hesret ku ez helbestekê, diyariyekê, çîrokekê yan jî xelatekê bibînim ku ji van 12 salên Şoreşa Rizgariya Neteweya Kurdistanê re hatibin pêşkêşkirin. Tu dikarî bi hêsaniyê bi sed caran li gotina "pêşmerge" rast werî. Lê belê wekî ku bi taybetî sansurek danîbin ser gotina "gerîla".

Ev çî ecêb e!

Hem xwe jî çand û hunera kurdî re rêber dibîne, hem jî kesên ku xwîne didin û bi wê xwîne vê çandê diparêzin, nabîne. Hem li ser axa Kurdistanê "digirî" hem jî nobedarên wê axê bi tiştêkî nahesibîne. De werin em bi hev re navekî li vê helwestê bikin. Ev çî helwest e, çî tewr e, çî dirûfî ye?! Mesele ne nivîsandina navê gerîla ye. Gerîla me bi hacet e ku kovareke wiha navê wan binivîsîne. Gerîla bi xwe xwediyê wê hêza mezin e ku navê bi xwe binivîsîne. Ne tenê li ser çend rûpelên kovarekê, ew bi xwîna xwe, li ser rûpelên dîrokê dikare navê xwe binivîsîne. Pirs ne ev e. Pîrsa-herî giran di vir de ye: Çima em navê gerîlayekî li ser rûpeleke kovareke kurdî nabînin? Nivîskarekî ku parastin û pêşxistina çand û hunera kurdî ji xwe re dike îdiayek, wê çima qehremaniya gerîlayekî kurd nebîne?

Parastina çandê çî ye? Çand çawa tê parastin, çawa tê xurtkirin? Kî ye yê ku çandê dibêje "ez im nobedar û parêzvanê vê çandê.. Çanda min namûsa min e.." Dema ku me bersiva van per-

san da, wê demê emê bizanibin xwediyên rastin yê çanda me kî ne.

Çand bi nivîsandina çend gotaran nayê parastin. Çend çîrok jî, me ji gemara sedsalan paqij nakin. Bila em ji xwe re xeyala çênekin û nebêjin, me kovar derxist û her tişt temam bû, yan jî xwediyên dîrokê em in. Ew qas ne hêsan e ku mirov bibêje "Ev e çanda min û ezê heya dawiyê wê biparêzim, eger xwîn were xwestin jî, ezê tu caran nebêjim na!"

Belkî em hez nekin. Belkî xurûra di dilê me de dibe sebeb ku em careke tenê jî di helbesteke xwe de navê gerîlayekî nenivîsîn. Belkî nefsa me ji van 12 salên qehremaniyê mezintir be, lê belê divê em ji bir nekin ku meşa gerîlayekî, di seveke zivîstanê de, li Zagrosan, hezar carî ji mezinbûna me di koşeyekî odeyekê de, li bajarekî Ewrûpayê ku tenê bi navê "macir" em tê de tene naskirin, mezintir e. Tu qebûl nekî jî wisa ye.

Li vir em hev fêrî welatparêziyê nakin. Lê belê eger em ji hev hez dikin, divê em hinek tiştan binin bîra hev. Eger em îro wan rastiyan ji bir bikin, wê sibê di gorê de be jî hesab ji me were xwestin. Em hez nekin jî divê em rastiyan bibêjin. Emê çima hez nekin? Ev jî pîrsek e. Mirovê ku ji gerîlayê xwe hez neke û çend gotinên xweş ji wî re neke diyarî, çî qîmeta wî însanî heye? Ji ber ku çanda rastîn, exlaq, rûmet, kultur û hunera rastîn gerîla bi xwe ne.

Çiqas baş dibe, dema ku em li hemberî gerîlayên îro, ku şehîdên sibê ne, dev ji vê nefsbilindî û xurûra xwe berdin. Ev nefsbilindiya me, me biçûktir dike. Me jî welat û welatparêziyê bi dûr dixê.

Eger em gerîlayên xwe, di helbest, çîrok û hunera xwe de nebînin, emê kor bibin, emê li sûna dilê xwe kevirekî bibînin..

Partî lajek û maya ci

Sera 1990 bî, heveyê mebûs û roşnikarê kurd û tirkan yenê pêtek û Partiya Keda Şarî (HEP) nanê ro. Senî na partî nîyena ro, hema jew lajek telefon keno marda xo rê û vano:

– Dayê na partiya ki newe niyê ro, a partiya mava hîlbijartin beno se, raya xo bidê na partî.

O waxt partiya MHP wija xo rê jew ca tepşena, rêxistina xo vija jî akro. Qandê coya maya lajekî vana qayê lajê ci no MHP vano. Maya lajekî hema hêrs bena û vana:

– La bê mirad şiyaye mi ti qandê xayinan û celadan dê şardê xo ardê dinya, kutikê serdê siloy. Lajek:

– Dayê to ez çewt fahm kerda .

– Maya lajekî:

– Bewn mi ti çewt mewt fahm nêkardê, eger ti lajê minê se a partiya vergan hema virad, ti ki meviradê se ez şitê xo to rê helal nêkena. To di qe şeref û hesiyet çinyo. A partiya kurdan înkâr kena, awa wazena kurdan pêriknan îmha bikro, lajê mi no şino celatan dê şardê xo het, ca geno û qandê înan mi ra ray wazeno, çi ra ti qurbanê mi nê benê?

– Lajek:

– Dayê dayê ezo MHP nêvana, na-



mey partî da ma, Partiya Keda Şarî wo. Tirkî vanê Halkın Emek Partisi yanê (HEP). Na partî kurdan înkâr nêkena, nawa wazena kurdî zuwandê xo de qisey bikrê, awa vana eger kurdê xo wazênê se wa dewleta xo jî ronê.

Maya lajekî:

– E lajê mi e, mayê wazemi zuwandê xo di qisey bikim, deyrî bikim, mayê wazem mektebê ma, parlamenta ma û Kurdistanê ma jî bibo. Çira Kurdistanê Îraq, Tirkîye, Sûriye û Îranî esto de, Kurdistanê kurdan çinyo? Lajê mi quisir dê mi mewn, mi ti çewt fahm kerdo. Min vat qayê tiyê MHP vanê. Bewn lajê mi, ti jî zanê wenden û musayina ma

çinyo, qandê coya ti ma rê ablemê partî da ma birêş, ma jî raya xo bidim ci.

Lajek hema ablemê partî rêşeno. Maya lajekî hema ablemî musnena hemû cîranan û waxto zaf kilmî miyan di pêro partî şinasnenê û wija rêxistina ci akenê. Tayn waxt rafêreno , hema hema hemû ca dê Kurdistanî di rêxistinê na parti abyenê. Qandê coya dewlet tarsena hema qerarê hîlbijartinî gena, çimki jû partî ki kongreyê xo mekro, nêşena hîlbijartin kiwo. Qandê coya, HEP rê jî mecbûr mend liste dê SHP ra kewt hîlbijartin. Lajek na fin ablemê SHP rêşeno. Nê hîlbijartinî de HEP nezdiye 25 mebûsî vejyênê û bado SHP

ra aviryênê û name dê xo ya tekoşî danê. Sebeno se jî nûwa tepeya beno.

Dewlet ewnena hemû şaro kewn HEP miyan û tepşena HEP racenena. Na ki racenyê, nê tepşenê ÖZDEP nanê ro. Lajek na fin ablemê nay rêşeno. Dewlet nay jî racenena. Nê nafin DE nanê ro. Lajek ablemê nay jî rêşeno. Vêşî waxt nêravêreno, dewlet DEP racenena û mebûsanê ci jî çekena zîndan. Nê fina veng nêvindenê û nafi HADEP nanê ro. Lajek tepişeno ablemê HADEP jî rêşeno, ney senî ki rêşeno no maya lajekî hêrs bena û lajekî rê tê lefon akena, çîçi yeno ci fek ci rê vano. Çimki lajek telefon di nê vano Dewlet partiya ma racenena, awa jî vana qay lajê cino her roj jû partî de geyreno. Serva coya hema çi lajekî ra vana.

Lajek vano:


– Dayê tiya mesela nêzana, partî an ci zey veriya la belê nameyê ci verî niyo. Çimki dewleta racenena may akem, awa racenena mayê akem. Qandê coya awa nêşena ma ra ser akera.

– Maya lajekî: Bewn lajê mi eger tiy azadiyin, rindin û azadiyina Kurdistan wazênê se tîfing bigî (bici) vejîyê ko ser. Metropolitan di selatûyin kerdiş ra îmze arêkerdiş ra şores moreş nêbeno.

MEMED DREWÊ

BIXELAT...

Lêborîn: Di xaçepirsa hejmara 45'an de, di cihê wêneyê Kemal Pir de wêneyê Hayri Durmuş derketiye. Ji ber vê şaşiyê em ji xwendevanên xwe lêborînê dixwazin



Bersiva Xaçepirsa 44'an


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 46'an pirtûka **Firat Cewerî "GOTINÊN NAVDARAN"** e. **Jêrenot:**

Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 44'an, Pirtûka Firat Cewerî "Kevoka Spi" qezenc kirine: **Zeki Bazîd/Bazîd, İsmet Korur/Ruha, Tayîb Balka/Wan, M. Tahir Ertaş/Izmir, Nesim Emîne/Izmir**

GOTINÊN NAVDARAN

Amadekar: Firat Cewerî



XAÇEPIRSA BIXELAT (46)

XAÇEPIRSA

Meclis Kawayê hemdem (wêne)	7	Beyreq Fermana lezgîniyê	6	Rêxistîne-ke filistinî Elementek (u)	Kesê çavli der Herêm	Kesê ji rêxistina mason	Awir
Sûret. Sembola almin-yumê		Rastî, heqîqet Notayek	1Alende serokê Şili yê berê Dîms	Egoîzm Nas	3	Kuçik Careke dîn
Piştî dîayê tê gotin Kurtiya Êmîne	4	Dost, canan Tefsîr					Gor, mezar Ta, ben
Kampeke penaberan li Başur Rojek		Dayîka Muhemed Dîn			Dîji mê		
Toxtm, dendik Dema koletiyê				Nêzik	2		
	8						

PEYVA VEŞARÎ





'Tiyatro hewcedariyek e'

Destpêk Rûpel 8-9

Digel hewldan û wire (azm) û kedê, pêdivî bi bi rêxistinîtiyê heye.

Ji bo listikvanên Can Şenliği, cihê tip tenê ne salon in. Qehwexaneyekê gund, gastiñ û bëndereke gund, odeya gund heta axurek jî, ji bo pêkanî û çêkirina şanoyê bes e.

Tevî ku divê em xwe bigihînin-temaşevanên xwe û herin ber piyên wan jî, divê em şaşiyekê jî nekin; gerek e em nehêlin ew jî tiral bibin û ji cihên xwe neleqin. Em li bendê ne ku temaşevanên me hîn bibin ku şanoya me dengê jiyana wan, coş û raperî û serhildana wan e û ew jî bi me re bimeşin.

Wekî din, em dixwazin li xwendevanên Azadiya Welat jî deng bikin. Piştî ku we ev hevpeyvîn xwend em dixwazin hûn bifikirin ku şano ne tişteki li dirveyî we ye, hûn jî dikarin şano bileyizin û bizanibin ku şanoyê hewcedariyek e.

Hûn dikarin ji projeyên xwe yê di rojêva we de behs bikin?

● Em lêstikvanên Can Şenliği tim digerin, em di rewşeke koçerî de ne. Ji ber vê yekê nîgaşa (xiyala) me ya mezin, hebûna "kamyon-tiyatro" ye. Bi vê me dikaribû her tim perdeya xwe ji bînerên xwe re vekira û listên xwe peşkêş bikirana. Lê niha ev nîgaşek e.

Pêwistiya me bi studyoyekê tiyatroyê heye ku navenda wê li Enqeriyê be û em karibin çalakîyên xwe yê teorîk û pratîk pêk bînin. Em dix-

wazin di vê studyoya tiyatroyê de bi hemû mirovên ku ji Anadolê tên re, tiyatroyê çêkin.

Îcar em ji listikên xwe behs bikin. Em dê listika nivîskarê komediyê yê navdar î frensîz Molière ya bi navê "Tartof" derxin ser dik û sehneyê.

Em dê bi awayekî nû ve listikê derxin pêşberî bîneran û em dê bi kena xwe ya tinazwer hêzên serdest û serwer rexne bikin û wan bibihêcin.

Projeyekê me ku hatiye cih, heye. Ev, listika me ya ku navê wê, "Jinên Troyayî" ye. Ji aliyê hozanê tragediyayê Euripides ve, beriya zayîna Îsa di sala 200'î de hatiye nivîsîn.

Tê de tê behskirin ku çawa grekiyan (yewnan) êrişî gelê Anadolê kirine û ew qir kirine.

Em îro jî dibînin ku çawa li ser gelan çewsîn, tehde û pêkufî heye. Bi vê listikê em dixwazin bi temaşevanan rewşa şer, şidet û tevkujîyan bidine zanîn.

Em difikirin ku di demên pêş de projeyekê xwe ya din jî pêk bînin. Listik li ser serhildana Baba İshak, Baba İlyas û derwêşên wan e, ku di sala 1240'î de li hemberî selçûqîyan serî hildabûn. Ji vê re "İsyana Bâbaîyan" jî tê gotin.

Hemû gelê Anadolê bûbû yek û bi ser Konyayê, bi ser selçûqîyan ve meşiyabûn.

Ji derî van jî, em dixwazin gelek listikên din derxin ser sehneyê. Her wiha em giraniyê didin ser aliyê teorîk jî. Can Şenliği ta niha du pirtûk û heşt bulten weşandine.

Li Kurdistanê jin

Tevgerê neteweyî ku di nav xwe de jinan xwedî neke hem ji sedî 50 quweta însanî winda dike, hem jî bi tehdîta belavbûna civakî re rû bi rû dimîne. Eynî bi vî rengî rizgariya jinan jî bêyî şoreşê ne mimkûn e.

Komara tirk, ji bo ku ciwanên kurd xwe nas nekin û li mafê xwe nepirsin ji "listikên pişikê nêr" xirabtir, listikan tîne serê me. Ev rejîm dixwaze ku jiyana keş û xortên kurd reş bike, wan bike mirovên ji bo pergalê. Mesela: Ji hinekan re li ser navê "jiyana modern" jiyaneke heywanî pêşkêş dike.

Di vir de mirov nikare bifikire, wekî zarokên biçûk dibe û tê xapandin. Hinekan ji xwendin û dîtinan mehrûm dike, hinekan jî bi nîrxên erzan, wekî pere dikire. Di wir de armanc yek e: Pişaftin.

Divê kurd bi jin û mêr ve van listikan bê encam bihêlin, çimkî ev hovîtiya ku li ser gelê me didome, ancax bi yekîtiya neteweyî jî holê radibe.

Lê di civakên wekî neteweya kurd, ên lipaşmayî de li ser jinan, li gorî mêran, ji bilî çewisandina ji ber nasnameya neteweyî, zilma ji

ber-cinsiyetê jî heye. Di bin bandora edet û toreyên kevneperest de bi zikreşiya paşverûyan jin zêdetir tîne pelçiqandin. Zarokên qîzî nîkarin bixwînin, malbatên wilo hene ku keçên wan xwarin û vexwarinê jî tevî wan naxwin.

Gelo heta ev dîtinên feodal neyêne şkestin, mirov dikare behsa şoreşekê bike? Bi awayekî pir pir siruştî bersiv na ye. Çimkî tevgerê neteweyî ku di nav xwe de jinan xwedî neke hem ji sedî 50 quweta însanî winda dike, hem jî bi tehdîta belavbûna civakî re rû bi rû dimîne. Eynî bi vî rengî rizgeriya jinan jî bêyî şoreşê ne mimkûn, ango em dikarin bibêjin jin û şoreş bêyî hev nabin.

Gerek jinên kurd jî her tiştî ji destê mêran hêvî nekin û hem tekoşîna hemcînsên xwe hem jî ya gelê xwe pêk bînin.

Divê jinên kurd ji neteweya kurd jî mafê xwe bi destê xwe bîsînin. Min dixwest ku hevalên qîz jî, ji Azadiya Welat re nameyan bişînin û ramanên xwe hisên xwe, gilî û gazincên xwe diyar bikin. Raman û dîtinên xwe bê-tirs êşkere bikin. Lê ez qet rastî wan nameyên bi vî rengî nehatim.

Ez bawer dikim şoreşa Kurdistanê jî şoreşa jinên Kurdistanî jî dê ji bo gelên Rojhilata Navîn û gelên dinyayê bibe mînake baş.

SADÎ GÖZGEN

Ramazan Kaya
(06.11.1996)

*Ey dezayê min.
Ey torinê Amêr Rasmûn,
Ey ambaz Remo ciwanê çilkanî
Ey şervan Munzur, şehîdê Kurdistan*

*Me to ra zaf çiy nûsey,
Çevres roz beno;
Roz bi roz bêriyê tu zêdeno,
Qet xem mekir aşan rakur.
La ro erê heyf şîma biyir.*

Ahmet Kasım

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerîndendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÖNERÎTIYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimîndendeyê Giştî
yê Ewrûpâyê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsiv
963-21-960099

Berlin:
Silêman Sîdo
49-30-69002695

Hannover:
Selîm Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robîn Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Li Kurdistanê mamoste bi çek digerin

Di danezana komcivîne ya encam de biryara têkoşîna tevî hev, hate stendin.

Hêzên ku KPD'ê pêk tînin wê bibin Yekîtiya Perwerdehiya Demokratîk. Her wiha di her warî de ji bo xebat û programên firehtir biryar hate stendin.

Xwendekaran, mamosteyên zanîngehan, malbatên xwendekaran û ronakbîran, di 7-8'ê berfanbara 1996'an de "Komcivîna Perwerdehiya Demokratîk" (KPD-Bi tirkî Demokratik Eğitim Kurultayı) li Stenbolê li MED-KOM'ê li dar xistin.

Di komcivîne de 76 danezan hatin pêşkêşkirin. Axivgeran li ser "perwerdehiya demokratîk" dîtin û pêşniyazên xwe pêşkêşî beşdaran kirin. Komcivîn bi piştgiriyeke mezin pêk hat. Ji bakurê Kurdistanê û Ewropayê 250 kes û saziyan ji bo civîne piştgiriya xwe bi mesajan diyar kirin. Komcivîn ji aliyê 1000 kesî ve hate temaşekirin. Ji Ewropayê jî 15 kes beşdarî komcivîne bûn. Piştgiriya nivîskarê Îslamî Abdurahman Dili-pak jî, bala beşdaran kişand. Komcivîn ji aliyê Komaleyên Xwendekaran, Yekîtiya Lîseyiyên Demokratîk yê Stenbolê (IDLB), Yekîtiya Demokratîk ên Xwendekaran (DÖB), Komîsyona Ciwanên ya HADEP'ê û Ciwanên Welatparêz ve hate lidarxistin.

Axivgeran bi giştî ev daxwaz anî zîmên: "Pere ji bo perwerdehiyê, ne ji



bo şer. Perwerdehiya belaş, bi zimanê zikmakî perwerdehî, mafê avakirina komeleyan û beşdarbûna rêveberiyê, rakirina kontrola bekarîyê. Rakirina YÖK'ê û ÖSS-ÖYS'ê, rakirina dersên dinî yê mecbûrî, rakirina kincên tektîp, terikandina perwerdehiya nijadperest, şoven û pişefkar, zanîngeh û dibistanên bêpolis û cendermê."

Di komcivîne de bi taybetî, li ser têkiliya sazûman û pirsgerêkan hate rawestîn. Hate gotin ku, heta şerê qirêj neqede tu pirsgerêk nayên çareser kirin. Her wiha hate diyarkirin ku bi arizîkirina (özeleştirme) perwerdehiyê, perwerdehî ne wekî mafê edî wekî îmtiyaz tê dîtin. Ji bilî van mijaran, mafê perwer-

dehiya bi zimanê zikmakî jî hate parastin.

Perwerdekar H. Basri Aydın got: "Eger ku tu ziman û stranên mirovan qedexe bikî, helbet mirov wê derkevin ser çîyan." Aydın axaftina xwe wiha domand: "Ez dewleteke ku bi kûçikan êrişê ser mirovan dike û dewleteke ku 400 sal ceza dide İsmail Beşikçi, nas nakim."

Nivîskar Orhan İyiler jî got ku pêwistiya dinyayê kominîzm e. Pişt re jî wiha axivî: "Hûn jî bo zarokên kurd ên ku nikarin bixwînin, ji bo hemû zarokên ku nikarin bixwînin bi rê ketin. Hûne dê ji nişfa 68'iyî jî pêşketitir bibin." Li ser navê Ciwanên Welatparêz Aziz Kaya axivî û wiha got: "Pirsgerêka zîmên, bêyî çareserkirina pirsgerêka mêtîngiriyê çareser nabe. Ji bo jinavê-rakirina neteweyekê, di serî de ziman jî holê tê rakirin, komara tirk jî politîkayeke wiha dimeşîne."

Di komcivîne de axaftina herî balkêş a Musa Gezer bû ji ber ev axaftin bi zimanê kurdî bû beşdaran gelekî eleqe nîşan dan. Di tevahiya komcivîne de bi tenê ji bo wê axaftinê beşdaran li ser piyan û bi deqîqeyan li çepikan dan. Musa Gezer li ser navê Komcivîna Perwerdehiya Demokratîk'a Amedê axivî. Gezer diyar kir ku, tevî her tiştî jî, şerê qirêjî paqijîya gelê kurd xera nekiriye û wiha domand: "Li Kurdistanê mamoste ajanên sûbjektîf û objektîf

in û mamoste bi çekan digerin."

Necmettin Uğur, li ser navê şaxa yekemîn a Eğitim-Senê (Sendikaya Perwerdekaran) axivî û beşdarnebûna Navendiya Giştî ya Eğitim-Senê rexne kir. Uğur wiha got: "Dewlet kurda wekî hindikahiyeke ku nebûye netewe dide nasîn. Bi vê yekê jî, ji raya giştî ya navneteweyî re dibêje 'Kurd nikarin dewletekê ava bikin û mafê wan nîn e.'"

Di komcivîne de mêvanê herî balkêş jî endamê HADEP'ê Abdulhalil Gümüş bû. Gümüş diyar kir ku, 21 salan di nav Partiya Refahê de xebitiye û di salên xwe yê lîseyê de piştgiriya çalakîyên Deniz Gezmiş kiriye. Her wiha Gümüş acizbûna xwe ji bo binavkirina wekî "kevneperest", "olperest" diyar kir. Gümüş pesnê jiyana şoresgerên girtîgehan da û got ku divê hemû mirovên vî jiyane bibînin. Gümüş jî herkesî ji banga piştgiriya bindestan kir.

Di danezana komcivîne ya encam de biryara têkoşîna tevî hev hate stendin. Hêzên ku KPD'ê pêk tînin wê bibin Yekîtiya Perwerdehiya Demokratîk. Her wiha di her warî de ji bo xebat û programên firehtir biryar hate stendin.

Bandora ciwanên welatparêz û komcivîne de qels û lawaz ma. Giriş û pêwistiya zimanê zikmakî bi awayekî têr nehate vegotin. Diviyabû axaftinên bi kurdî zêdetir bûna.

